

- *Birader: "Gerek mirov bûyeran bi hunerî bihone"*
- *Tarîxê Kurdistanî yo nîzd de şexsiyetêkew pîl: Osman Sebrî*



*Aştîxwaz di 8'ê vê mehê de li Stenbolê dest bi "kampanyaya ji bo aştîyê milyonek îmze" kirin. Berdevkiya vê kampanyayê Parêzer Eşber Yağmurdereli dike.*

## Ji bo aştîyê înzeyek...

NAVEROK



M. Hemo: Pira Siratê li ber me ye

6



Dildar Şeko: Helbestvanekî pêjker Deham Evdilfetaş

10



M. Agirî: Kurdan qetlîfama li Zindana Amedê protesto kir

11

Ji Xwendevanan

WEKÎ tê zanîn zimanê kurdî çar parçe ye, ev jî kurmançî, soranî, goranî û kirdkî ye. Gelê kurd dixwaze ku welatê xwe rizgar bike.

Gava me yekîtiya azadiya Kurdistanê li ser çar parçeyan çêkir, gerek e em yekîtiya ziman jî çêbikin. Kurmançî li aliyê bakurê Kurdistanê, Başûr, Başûrê biçûk, li nav kurdên Kafkasê û Rojhilatê tê zanîn. Zazakî jî li aliyê Bakur, soranî jî li aliyê Başûr, Goranî jî li aliyê Rojhilatê zarê xebirandê ye. Li vir ev tê xuyakirin ku hema hema li her cihê Kurdistanê zimanê kurmançî baş tê zanîn. Ji ber vê yekê yekîtiya ziman li ser kurmançî tê çêkirin.

Gerek hemû kurd hîni kurmançî bibin. Yekîtiya zimanê xwe wisa çêbikin. Divê wisa neyê fêmkirin ku ew zaravayên din werin jibirkirin. Divê em wan jî baş bizanin û bipeyivin. Gel mecbûr e ku zaravayekî baş bizanibe.

Aniha rojnameya Azadiya Welat digihîje destê min, ez bi kirdkî xeber didim. Ez nû hîni kurmançî dibim. Ji bo vê jî ji min re ferhengok hewce ye. Ez dixwazim hûn cihêki ferhengokê li nav rojnameyê çêbikin.

EGÎT JI GIRTÎGEHA MUNIHÊ



Li ser helwesta Avestayê

MEHMET GEMSİZ

Hefteya çûyî, me nivîsa Weşanxaneyê Avestayê ku bi rasernavê "Tekzîb" ji me re hatibû şandin, di rûpela 13. de weşandibû. Di hejmara xwe ya çûyî de me bersiv neda weşanxaneyê.

Li ser weşandin û neweşandina wê nivîsê, em Heyeta Weşanê li hev rûniştin û di encama civînê de em gihyan biryara weşandina wê.

Di wê nivîsê de weşanxaneyê hem bersiv daye D.Ş. Tizyanî. Ji hêla din vedi eynî nivîsê de rexne li rojnameya me jî girtibû.

Di nivîsa Tizyanî de, ya bi navê "Ji Evdila Peşew ne helbest helwest" (hej. 35, rûp. 13) li hemberî Avestayê tu gotin û tawanbarî nîn in, ji bilî pesndanê. Ev yek. A din, heta îro di rojnameyê de li dijî Avesta û karên wan gotinek jî dernekiye.

Mayê ku ji me hatiye me wek rojname û wekî şexs alîkariya Weşanxaneyê Avestayê kiriye. Me xwendevanên xwe, heman hemen ji hemû berhemên wê agahdar kirine. Em dikarin bibêjin ku, me pêşî dor daye weşanên wê jî.

Heta îro ne tenê rojnameyê, xebatkârên wê jî neyariya tu kes û saziyê nekirine.

Belê, xebat û kirinên me li ber çavan in. Serê me bi wan bilind e. Ha, şaşî û kêmasiyên me çênebûne qey? Em jî vê yekê re nikarin bibêjin "Na". Lê, çi gava ku em bi wan hatibin hesandin, an jî bi wan heşiyabin, me ew sererast kirine.

Em jî xwe re nabêjin ku em tu carî şaşiyên nakin an kêmasiyên me çênabin, jixwe çênebin em dê biheyirin!

Îcar ji ber çi ye ku Avestayê helwesteke wisa li hemberî rojnameyê daye nîşan, em jî nizanin.

Me li jorê jî got, li dijî Avestayê tu tiştekî neyînî nehatiye gotin. Rexne û nixandin der barê wergêrên pirtûka "Birakujî" ya Evdila Peşew de hene. Mafê gotin û bersivê ya wan kesan e, ne ya Avestayê ye. Ew tenê weşanvan e...

Avesta, ji şewaza (uslûba) Tizyanî gazinan dike, lê belê ya wê ji ya Tizyanî bihartiye.

Ne naveroka nivîsê, ne metoda wê û

ne jî şewaza wê tê pejirandin. Em naxwazin li ser "îdia" û "îtham"ên Avestayê hebo hebo rawestin. Bi rastî, em dixwazin karê xwe bikin.

Karê me jî ne tenê agahîdan û agahdarîkirin e. Ev ne rojnameyê nûçeyî ye. Her cure nivîs, mijarên wan çi dibin bila bibin, em dixwazin biweşînin.

Rojnameya me, rojnameyê çandî, hunerî, wêjeyî, nûçeyî... û siyasî ye. Kî bixwaze li ser çi binivîse, dinivîse. Mafê me nîn e ku em têkilî bi mijarê bikin. Bi kurtî, em bi awayekî sparijî (siparîşî) nivîsan nadin nivîsandin.

Me heta niha têkilî bi kar û barê kê kiriye?

Eger em bîrên ser nivîsên ku di rûpela me ya "Berhem" de derdikevin, heta niha di wê de berhem hatine nasandin, nixandin û rexnekirin.

Nivîskar bi çi awayî nêzîkahî di berhemê dide, ew serbest e. Kîjan hêlên wê baş dibîne, kîjan ne baş dibîne, ew tercîha nivîskar bi xwe ye.

Vatîni û erka ku dikeve ser redaksiyonê, nixandina şewaz û hêjahîbûna nivîsê ye.

Wekî gotina dawî em vê bibêjin. Bi taybetî me wekî rojname bersiva Avestayê neda û me nexwest em xwendevanên xwe di bin bandorê de bihêlin.

em her tiştî ji teqdîra xwendevanên xwe re dihêlin.

Çepgirî û îslamiyeta tirkan

MURADÊ SURUCÎ

Çepgirî û îslamiyeta tirkan ji wateya rast bi dûr ketiye. Bi hemû aliyên xwe tevî nav refên nijadperestiyê-bûye. Kesên ku dibêjin em çepgir in, kemalîzmê bi dil û can diparêzin. Di civîn û xwepêşandanên xwe de wênayê Atatürk bi kar tînin. Li gorî wan Atatürk rêberê çepgiriya tirk e. Atatürkê ku bi fermana wî Mustafa Suphi û hevalên wî yê komunist di Behra Reş de hatin xeniqandin, çawa dibe çepgir? Hemû gerdûn zane ku Atatürk nijadperestekî tirk e.

Pergala ku wî ava kiriye, li ser bingeha nijadperestiyê ye. Ji bo ku mirov vê rastiye bibîne ne lazim e ku mirov zanîngehê kuta bike û ne hewce ye ku lêgerînên zexm bike. Piçekî ku mirov çav li dora xwe bigerîne, dibîne ku gotina wî ya "Xwezî bi wî kesî ku bi-çêje ez tirk im" li hemû sazî û avahiyên hatiye nivîsandin.

Gelo bi vê gotina wî ne diyar e ku ew nijadperest e? Ji pênc tîrên wî yek jî neteweperestî ye. Lê neteweperestîya wî ji welatparêziyê zêdetir nêzî nijadperestîye. Gotina wî ya bi rengê "Yek tirk berdêlî dinê ye" nijadperestîya wî careke din dide selmandin. Tê xuyakirin ku kesên kemalîzmê diparêzin ne çepgir in, ew nijadperest in.

**Bi van kirinên wan du tişt derdikevin holê. An bi çavê misilmanan li kurdan nanêrin, an jî ew ne misilman in. Ji ber ku hemû dinya zane ku misilmaniya gelê kurd ji dil e. Wê gavê yek tişt dimîne, ew di îslamiyetê de ne samimî ne. Ango di bin maskêya îslamiyetê de rûyên wan î nijadperest veşariye.**

Çawa ku fêmkirina wan a çepgiriye li ser bingeha nijadperestiyê ye, fêmkirina wan a îslamî jî serdanpê nijadperestî ye. Kesên misilman in an jî kesên ku hinek dîroka îslamiyetê xwendibin, zanin ku îslamiyet li dijî stemkarî û pêkûtiya Ebû Cehil, Ebû Leheb bûye, alternatîfek bûye ji bo stembaran. Yezdan di pirtûka xwe ya pîroz de dibêje: "Berhema min a herî pîroz mirov e" ji ber vê yekê ji bo misilmanan mirovperwerî û parastina mafên mirovan a rastîn bûye merca îslamiyetê û nijadperestî hatiye lanetkirin û qedexekirin. Muhammed (a.s) di hedîseyên xwe de sê caran diyar dike ku, "Kesên nijadperest ne misilman in".

Gava ku mirov vê misilmaniya Muhammed û misilmaniya Tirkîyeyê dide ber hev, tê dîtin ku di navbera wan de wekî çiyar cudabûn û dijîti heye. Misilmaniya di bin destê Erbakan û Türkes de bi navekî tê bilêvkirin ew jî "faşîzm" e. Ev hezar sâl in li ser gelê kurd û hinek gelê din ê stembar, tu politikayên qirêj neman ku bi

kar neanîne. Neheqî û bédadiyek e di dîrokê de bê mînak li hemberî gelê kurd didomînin. Kurdên ku her wext ji bo cerdên li ser îslamiyetê bûne mertal, kurdên ku li her cihî bûne parêzerê îslamiyetê îro wekî neyaren îslamiyetê didin xuyakirin.

Rayedarên Tirkîyeya ku bi neyaren îslamiyetê yê wekî îsrailê re hevkarîya leşkerî û istixbaratî kiriye, devê xwe vedikin behsa Quran û yezdan dikin, xwe wekî rêberên îslamiyetê didin xuyakirin. Li aliyekî dibêjin misilman bira ne, li aliyê din kurdan qetil dikin. Li aliyekî jî bo Bosna û Çeçenistanê hêstiran dibarînin, aliyê din di ser serê kurd de gule û bombeyan dibarînin.

Bi van kirinên wan du tişt derdikevin holê. An bi çavê misilmanan li kurdan nanêrin, an jî ew ne misilman in. Ji ber ku hemû dinya zane ku misilmaniya gelê kurd ji dil e. Wê gavê yek tişt dimîne ew, di îslamiyetê de ne samimî ne. Ango di bin maskêya îslamiyetê de rûyên wan î nijadperest veşariye.



**KOMELEYA** Mafên Mirovan (IHD) dixwaze bi awayekî giştî xwe nû bike. Komeleya Mafên Mirova (IHD) şaxa Stenbolê civîna giştî ya awarte ya 6'an roja 6'ê kewçêrê li dar xist. Piştî diyarkirina endamê rêveberiyê, civîna dest pê kir. Serokê Giştî yê IHD Akın Bîrdal der barê giştî û li ser xebatên IHD'ê axaftinek kir. Ji ber ku kesek ji bo serokatîyê nebûbû endam, ji bo demê kurt serokekî demdemî û kargerîyê demdemî hatin hilbijartin. Hilbijartin pîranî ji bo endamên kargerî û rêveberîyê komeleyê bû, wê piştî du mehan careke din ji bo serokatîya IHD'ê û endamên rêveberîyê IHD'ê werne hilbijartin.



**ENSTÎTUYA** Navneteweyî ya Lêkolînên Stratejîk, bi navê "Li Cîhanê Hevkêşeyên Leşkerî" raporek amade kir. Di raporê de tê gotin ku ji endamên NATO'yê, bi tenê li Tirkîyeyê hêzeke çekdar a dijber heye. Li gorî raporê, hejmara şervanên PKK'ê yê li Tirkîyeyê 10 hezar e û 50 hezar jî piştgirên wê hene. Li aliyê din Wezîrê Dewletê Bekir Aksoyê ku ji bo sê rojan li cihê Mehmet Ağar bû wezîrê karê hundirîn tv û perwerdehiya bi kurdî wekî taktîkeke PKK'ê bi nav kir. Aksoy, roja 9'ê kewçêrê li Akademiya polîsan got: "Ev tişt wê bibin sedema pêkhatina nas-nameyê kolektîf."

## NÛÇE

# Ji bo aştiyê înzeyek...

DIK

'Xoce kete erdê!'

Ji aliyê ve hewldanên aştiyê xurt dibin, lê ji aliyê din ve jî, şerxwaz nahêlin ku kes çavên xwe veke. Dema yek navê kurdan hilde, agir ji devê wan dibare... Ji ber ku Serokê Cemahîra Libyayê Muammer Qaddafi bi munasebeta ziyareta Erbakan a Libyayê got: "Di bin roja Rojhilata Navîn de, divê ev mîlet jî cihê xwe bigire. Kurd jî misilman in, bi faris û ereban re bira ne."

Şerxwazan şûrê xwe ji bo Erbakan hesan kirin. Ji ber ku Erbakan çûye Libyayê. Em ji çapemenî û siyasethanên wan bêşirove çend mînak bidin:

"Erbakan dîn e."

**Mesut Yılmaz**

"Wê Tirkîye (wî) efû neke"

**Manşeta Yeni Yüzyılê (8'ê kewçêrê)**

"Ew manyakê bi navê Qaddafi ve cesaretê ji ku distîne?"

**Emin Çölaşan**

"Xoce temamê Tirkîyeyê dixê cihê keran!"

**Manşeta Yeni Yüzyılê (9'ê kewçêrê)**

"Bayê derewan"

**Manşeta Hürriyetê (10'ê kewçêrê)**

"Herhal rezaleta herî mezin ev e"

**Oktay Eksî**

"Wê mîlet hesab bipirse"

**Manşeta Hürriyetê (7'ê kewçêrê)**

"Ev rewşeke şermê ye. Wê meclîs dest deynê ser vê rewşê û wê hesab ji Erbakan û hikûmetê bixwaze"

**Deniz Baykal**

"Meczubê Libyayê ders da"

**Ferai Tmç**

"Ez ji Xoce nefret dikim"

**Fatih Altaylı**

"Xoce kete erdê"

**Mustafa Dağistanlı**

"Ji ber vê kepezetiye wê hikûmet bikeve?"

Nakeve..."

**Bekir Çoşkun**

R. DILOVAN

**Eşber Yağmurdereli**  
**li ser kampanyayê ev tişt got:**  
**"Yên ku aştiyê dixwazin pir in, lê deng ji wan dernayê. Însiyatîfêke bi vî rengî wê rê li pêşîya wan jî veke... Yanê em dixwazin ku însan li mala xwe, li derve, li kuçeyan, li ba cîranên xwe bikaribin qala aştiyê bikin. Dêrê me ev e..."**

**B**erî niha bi çend mehan hinek aştiwxaz û bi taybetî ji rewşên birên aştiwxaz ji bo aştiyê li hev civiyan û dest bi xebatê kirin. Îro ew xebata wan mirovên fedakar berhemên xwe dide. Di 8'ê meha kewçêrê de li bajarê Stenbolê li Otêla Dedemanê aştiwxaz li hev civiyan û biryara xwe ya kampanyaya aştiyê diyar kirin. Di bin sermava "Ji bo aştiyê milyonek îmze" de, wê milyonek îmze berhev bikin û bi daxwaznameyê pêşkêşî parlamentoyê bikin. Di nameya îmzeyê de bi tenê gotina "Aştiyê dixwazim" heye.

Kesên navdar ên mîna parlementerê kurd ê berê û nivîskarê me Abdülmelik Fîrat, Ercan Karakaş (membûsê CHP'ê), Aslan Başer Kafaoğlu, Ahmet Türk, Sırrı Sakık, Hüseyin Ergün (serokê YDH'ê), Ufuk Uras (serokê ÖDP'ê), Şanar Yurdapınar, Güven Özata (cîgirê serokê HA-DEP'ê), Kemal Daysan (sekreterê giştî yê DİSK'ê), Yılmaz Çamlıbel, Koray Düzgören, F.Hüseyin Sağnıç, Prof.Gençay Gürsoy, M.Emin Altun (saymanê HADEP'ê), Semra Somersan, Kemal Parlak, Murtaza Demir (serokê giştî yê PSAD'ê), Mehmet Metiner beşdarî vî civînê bûn.

Û di nav beşdaran de yekî balkêş hebû: Dewlemendek ji yê herî mezin ê Tirkîyeyê İshak Alaton. Ev cara yekemîn e ku dewlemendekî ev çend mezin li Tirkîyeyê tevî çalakîyê aştiwxaziyê dibe. Û li gorî daxuyaniyan di destpêka îmze berhevkirinê de wê Sakıp Sabancı jî piştgiriyê bide aştiwxazan û wê vî piştgirîya xwe di programeke televizyonê de diyar bike. İshak Alaton li ser aştiyê wiha axivî:

"Ez bi xebata ji bo aştiyê îftixar dikim. Cihê ku aştiyê lê hebe însan li wir jî û xebatkar dibin. Ez naxwazim dayikên çavên wan tijî hêstir û bavên xemgîn bibin."



Li Otêla Dedemanê kampanyaya "ji bo aştiyê milyonek îmze" hate lidarxistin. Berdevkiya kampanyayê Eşber Yağmurdereli dike (ji milê rastê ve kesê yekemîn).

nim. Ez zarokên ku li ser sergoyan li nane bigerin jî, naxwazim."

Nivîskarê me Abdülmelik Fîrat di axaftina xwe de wiha got:

"Li Tirkîyeyê îdareyeka zalim û xoyrat li ser kar e. Her çendî yê ku li min zulim kiribin, ez nikaribim ji wan re bibêjim baş in jî, em ji bo selametiya welat bi wan re rûnîn, bi axivîn. Pirsgrêkan çareser bikin."

Membûsê CHP'ê Ercan Karakaş jî di axaftina xwe de got ku bi rasti jî pêwistiya Tirkîyeyê bi aştiyê heye. Û li gotina xwe zêde kir:

"Bêyî ku aştiyê hebe, me tevan dît ku ne mimkûn e demokrasî were. Ji bo aştiyê rawestandina çekan tenê, tabîî ne bes e. Lê divê berî her tiştî çek bêne rawestandin. Rawestandina çekan jî bi diyalogê mimkûn e. Riya vî jî di bêtirsî û cesaretê re derbas dibe. Mixabin parlamento di rewşeka wisa de ye ku nikare gavên bêhtir biavêje."

Avukat Eşber Yağmurdereli jî bo berdevkiya aştiwxazan hate hilbijartin. Berdevkê aştiwxazan Eşber Yağmurdereli daxuyaniya da rojnameya me ku ji bo çalakîyên aştiyê di serî de dewlemend wê bi her hêz û rêxistinî re bikevîne tîkiliyan. Eşber Yağmurdereli gotina xwe wiha domand:

"Dema bi yekî re di axivîn, em dibêjin înzeya we tenê tîr nake, divê hûn bi derdorên xwe re jî bikevîne tîkiliyan û wan

ji bo aştiyê îkna bikin. Bi vî awayî em bi temamê rêxistinê dewlemendan re jî ketin tîkiliyê. Qismekî wan jî, piştî ku kampanyaya aştiyê dest pê bike, wê piştgirîya xwe bi civînên çapemeniyê, bi programan diyar bikin. Emê ji aliyê ve civînan xwe tim berdewam bikin û yê ku piştgirîya xwe diyar bikin jî wê di nav xwe de civînan xwe li dar bixin."

Eşber Yağmurdereli dibêje ku mebesta wan ew e da ku gel li aştiyê xwedî derkeve, li ser aştiyê bi axivî, aştiyê bixwaze. Dibêje li gorî daxuyaniyan ên ku ji bo aştiyê herî zêde li wan geriyane malbatên leşkeran in.

Demê me ji Eşber Yağmurdereli pirsra "Li gorî we ji bo vî kampanyaya we re aksiyoneke çawa mîsan bidin?" kir, wiha bersiva me da: "Vê gavê reaksiyoneke baş heye... Me ji xwe re hesabek çêkir: Li Tirkîyeyê tim şerxwaz di axivîn. Yê ku aştiyê dixwazin pir in, lê deng ji wan dernayê. Însiyatîfêke bi vî rengî wê rê li pêşîya wan jî veke... Yanê em dixwazin ku însan li mala xwe, li derve, li kuçeyan, li ba cîranên xwe bikaribin qala aştiyê bikin. Dêrê me ev e..."

Ji xeynî ew kaxezên ku ewê çap bikin û belav bikin, divê kes ji ba xwe ve li ser kaxezên alelade îmze berhev nekin. Kesên ku bixwazin der heqê kampanyayê de xwedî agahî bibin, dikarin li vî telefon û faksê bigerin: (0212) 252 38 68

RAHMÎ BATUR

*Tarîxê Kurdistanî yo nîzd de şexsiyetêkew pîl:*

# Osman Sebrî

**Eşîrey Mirdêsî verî hetê dewletê de bena, la dimay Serhildaney Şêx Seîdî zanê ku go dewlete bêro înan ser, qîrar danê ku mektûbêke Şêx Seîdî rê bişrawê. Mektûbê xwi de vanê ku: "Eger şîma biresê Soyreke ma go zî Intab, Semsûr û Ruha bigîrin." Çi heyf ku eskerên Şêx Seîd Efendî nêresenê Soyreke û dewlete zorê înan bena. Dimay Serhildane, dewlete wirdî dedanê O. Sebrî 1926'na de, Diyarbekir de îdam kena. Ew zî cezay îdamî gêno la semedê ku emrê yê qic o, îdam ra xelesêno û hewt serî cezay hefsî gêno.**

ROBÎN REWŞEN

Osman Sebrî 12.10.1993'na de wefat kerd. Serê mergê cê ra hîrê serî derbas bî. Osman Sebrî bi qey Kurdistanî zehf xebetîya û fedekarî kerde. La belê zehfîyey kurdan O. Sebrî baş nas nêkenê. Semedê a joy min waşt bi nuştîşêke O. Sebrî bi vîr biyarî û henêke behsê jiyane û xebateyê bikerî.


Osman Sebrî di serey 1905'na de Narince de dadê xwi ra beno. Narince dewêkey Kolik (Kahta) wa. Babê cê serokê eşîrey Mirdêsî, Sebrî Beg o. Sebrî Beg 1905'na de mireno. Dedê O. Sebrî Şukrî Begê mekteb ra gêno û keynay xwi dir zewecneno. O. Sebrî tenî şêş serî waneno û ew wext melimêkewo (mamosteyêke) kurd bi namey Îsmail Efendî fikranê xwi yê sosyalîstan ver surgun beno, yeno dewey înan. Îsmail Efendî hemberê axa, beg û şêxan o û zilm û niheqîya ku ro dewican kenê qebûl nêkeno. Enî fikranê xwi hemina O. Sebrî rê vano û zehf tesîr ro ê keno. O. Sebrî heta mergê xwi enî fikran sero maneno.

Eşîrey Mirdêsî verî hetê dewletê de bena, la dimay Serhildaney Şêx Seîdî zanê ku go dewlete bêro înan ser, qîrar danê ku mektûbêke Şêx Seîdî rê bişrawê. Mektûbê xwi de vanê ku: "Eger şîma biresê Soyreke ma go zî Intab, Semsûr û Ruha bigîrin." Çi heyf ku eskerên Şêx Seîd Efendî nêresenê Soyreke û dewlete zorê înan bena. Dimay Serhildane, Dewlete wirdî dedanê O. Sebrî 1926'na de, Diyarbekir de îdam kena. Ew zî cezay îdamî gêno la semedê ku emrê yê qic o, îdam ra xelesêno û hewt serî cezay hefsî gêno. Ê şîrawenê hefsê Denizli, badê di serî efû ra vecêno. Serbestî ê zehf nêramena dewlete ancî ê û 26 axa û serokeşîran gêna û îna Melatya de vecena vernî Dîwanê Herbî.

Etiya de Eskerî Hakim Hüseyin Hüsni yo, Dêrsimic hetê cê keno û veradano, dima ra zî te ra vano: "Eger ti tiya bimanê go dewlete to bikişo, tiya memane bireme şore." O. Sebrî xebereyê ê keno û remeno perçey Kurdistanî ku açaxî binê destê Fransa de bî.

Osman Sebrî etiya zî rihetî nêvîneneno enewey Fransa belay xwi sawita tera û wazenê ku ew hesabê înan ser bixebetîyo. Aşme 150 zêran û şêş dewan ê rê teklîf kenê ew qebûl nêkeno, hemberê înan û ê kurdê ku kewtê xizmetê Fransa, vecêno.

Dima ra kê Bedirxaniyan nas keno û beno endamê Xoybûnî. Bado ku Xoybûnî nas keno rexne zî keno û vano: "Xoybûn şarî ra dûrî yo, gerek biko miyanê şarî." Celadet Bedirxan vano: "Şar siyaset ra fam nêkeno." Ew zî ciwab dano û vano: "Ma zî verî çîke fam nêkerdêne, ma go înan bimûsnin." Ew hemberê kê



Bedirxanî û Xoybûnî vecêno. Dima ra zî Fransa ê surgûn kena.

Xoybûnî 1930 de qîrar girot ku bêrê hetê Serhildaney Agirî bikerê û xebere danê Osman Sebrî zî. O. Sebrî ew wext Raka de surgûn o û xebere şînawneneno dano pero yeno reseno hevalanê xwi. Hevalê cê te ra vanê: "Tu go hetê Sirûce wa şorê serê rey de di qerekolî estê, tu go înan rakerê, ma zî sîba resenê to û ma go şîn Ruha bigîrin, dima ra ma go henî merdîman bidin to û tu go şorê memleketê xwi Semsûr zî bixelesnê." Dima ra zî 24 merdîman danê O. Sebrî û înan senîn vatbî ê zî ana kerd, wirdî qerekolî dartîwe. Fransa

pê hesêna û pîlê ê 24 merdîman gêna û ê merdimî zî Osman Sebrî tenî verdenê û geyrenê. O. Sebrî rey xwi dewam keno, demêke Bakur de maneno û dima ra ewzî geyreno, di aşmî miyanê ereban de maneno û ewca ra zî şîno Başûro pîl. O. Sebrî wextêke qîrar dano ku M. Berzanî bikişo û enî fikrê xwi birayê cê Şêx Ehmedî ra vano, Dima ra M. Berzanî pê hesêno enewey ew wazeno O. Sebrî bikişo, O. Sebrî remeno, xelesêno. M. Berzanî kongrey partî xwi de vano: "O. Sebrî casûsê tirkano." Etiya zehf çî yenê sereyê la ew nêwazeno qal bikero. Vano eger ez qal bikerî go kes bawer nêkero û go vacê O. Sebrî zûran keno. Tesbîtê

O. Sebrî Başûrê pîlî sero cay xwi de yê û zehf objektîf ê. Ew, înan xizmetê neyaran de vînenî û vano ê çîrey neşkenê bibê yew û yewîfî virazê.

Gava kê Bedirxaniyan kovaranê Hawar û Ronahî vecenê veyndenê ê zî. Ew zî qebûl keno û O. Sebrî hendî kadroyê-kew girîng ê enî kovaran o. O. Sebrî hetê siyasî de C. Bedirxanî rê muxalîf o, la semedo ku têdir bixebetiyê serê şertêke de ro werê yenê. Gorey enî şertî ra gava wîrdî tê hete bê, gerek înan ra jo qalê siyasetî nêkero. O. Sebrî vano, kê Bedirxaniyan hema zî bi çimê mirîfî hanîyayne xwi ra û şar qic vînayne. La O. Sebrî mal û milkê xwi şarî rê kerdî vila û xwi çep, sosyalîst vînayne.

O. Sebrî dimay seranê 1950 î, henî hevalanê xwi dir wazeno partiyêke virazo. 1957'na de Partiyey Demokrati yê Kurdan virazenê. Gelêke hetan ro êrîşî yenê serê înan. Dewlete, komunîstê sextey, axa, beg û şexî û M. Berzanî û C. Telebanî. O. Sebrî seranê 1965-1969'na de beno sekrterê partî. Îxanetê kurdan o tarîxî etiya zî xwi mocneno ra û O. Sebrî yeno girotişî. Vernî mehkema de ew hucûm de wo, ew înan mehkema keno. Hîvey panciyes serî ceza wo la peynî de ser û nîm ceza gêto.

1970 ra dima siyaseto aktif veradano

## **O sman Sebrî dimay seranê 1950 î, henî hevalanê xwi dir wazeno partiyêke virazo. 1957'na de Partiyey Demokrati yê Kurdan virazenê. Gelêke hetan ro erîşî yenê serê înan. Dewlete, komunîstê sextey, axa, beg û şexî û M. Berzanî û C. Telebanî. O. Sebrî seranê 1965-1969'na de beno sekrterê partî.**

û tûtanê kurdan mûsneno wendiş û nişîşê kurdî. O. Sebrî di rey zeweceno, cenîyey cê ya verîne ra (keynay Şukrî Begî) lacêkey cê bi namey Welatoyî beno û seranê 1970'na de Kolik de yeno kişîşî. Cenîyey cê ya diyîna keynay zapî-têkey çerkezî ku artêşey tirkî de bi û eno zewacî ra hîrê lacî û hîrê keynay înan rê benê.

O. Sebrî heta seranê 1970, heystiyes rey kino hefsan û panc rey zî surgûn beno. O. Sebrî qaso ku siyasî yo endêke zî şarî o, la belê ew merdimêkew nefis pîl niyo û xwi şarî nêhesebneno. La bawerî cê bi şîr esto û vano: "Merdim eşkeno bi rey şîrî şarî aya bikero û raver bero." Şîranê Osman Sebrî de welatperwerî, şarî ra heskerdiş, yewîfî milete, azadî û serxwebûney Kurdistanî, hemberê ê kesanê ku bi qey menfîetê xwi kunê xizmetê neyaran û zehf çiyê binî estê.

O. Sebrî 55 serî zîwanî sero xebetîya û waştêne heme kurdî bi zîwanê xwi xebîrî bidê û binîsnê. Û vatêne meselay zîwanî dimay serxwebûney Kurdistanî ra yena, bi qey kurdanê bakurî zî vatêne tûtanê xwi dir kurdî xebîrî bidê û wahîr ro şoreşê xwi veciyê ku heta şîma bire-sê azadî û serxwebûney Kurdistanî. Xizmetê C. Bedirxanê kurmancî sero teqdîr kerdêne û vatêne ew ku biwazo kurmancî binîsno û raver bero gerek rey xwi bifîno mektebê C. Bedirxanî û ê zî xwi şagirtê enî mektebî vînayne.

Wesarê 1993'na de bi qey karêkewo siyasî ez şîbiya Rojhilato Miyanî. Bi qasê heftiyêke ez kê partî de menda. Wexto hevalan va ma şin kê O. Sebrî ez zehf kêfweş biya. Ê hevalan ra jo şehîd Yılmaz Uzun bî. Gava ma resay keye nêweş bî, miyanê cay de bî. Min waşt ez destê enî însanê pîlî miç bikerê, la qebûl

nêkerd. Vîst û hewt rocî bî ku wer nêwerdîbî. Vatêne wexto ez wer wena canê min hekêno û gava ez hekêna zehf deceno. Dêse odayê cê de fotografêkeyê ê û serokî daleqneyebî, serê sîney cê hetê çepî de zî rozetey ARGKî bibî. Odayêkewo bîn de zî gelêke fotografê ê û hevalanê cê yê wextê Xoybûnî ra daleqneyebî. O. Sebrî vatêne Kurdistan an-cax bi zorê sîlehî bixeleşîyo, çimkî neyaran bi zor girotibî. Bawerî ê bi serxwebûney Kurdistanî temame bî, ê paştay xwi bi teber wa girênêdayne bi xwi û bi şarê xwi bawer bî, neyarê populîzmî bî. Ê zilm ra remayîş çewt vînayne û vatêne lazim o merdim hemberê zilmî şer bikero. Jiyane de felsefeyê ê eno hawa bî; serey xwi nênan ro, sereberz mireno. Di peynî de merdim eşkeno vaco ku O. Sebrî prototîpê a şexsiyete wo ku PKK û Serokatî cê wazênê Kurdistan de virazê.

### **Çime (çavkanî)**

Welat mr. 54, 55, 87-1993

Berxwedan mr. 71-1989

Armanc mr. 142, 143-1993

Q. Kurdo, Tarîxa Edebiyata Kurdî 1

Roportajê O. Sebrî 1984-1988, Amed û Zîn (çap nêbiyo)

Çiya mr. 1-8; 1965-1970

## **Em û Cîhana Sofî**

DILBIXWÎN DARA



Em kî ne? Em çîma dijîn?" Romana "Cîhana Sofî" ku niha li Ewrûpayê wekî yekemîn roman tê hesibandî û tenê li Almaniyayê, ji wê di demeke kin de milyonek hatiye firotin û li 38 zîmanan hatiye wergerandin, bi van pîrsên jorîn dest pê dîke. Ev pîrs serê keça 15 salî Sofiyê diêşînin. Bêguman, bersiva pîrsên wiha giran li cem filozofan têne dîtin. Lê belê her çiqas giran bin jî, Sofî xwe mecbûr dibîne ku bersivê bide.

Ev pîrs di nava hinavên Sofiyê de wekî xwîne digerin, dibin parçeyek ji jiyana wê. Ew kî ye? Çîma dijî? Mirov kengî diçe? Pîrs gelek in... Lê belê serêşîya Sofiyê ji du nameyên bê navîşan û bê xwedî tê.

Dama ku min roman xwend min dît ku ne tenê Sofî, di wê romanê de em hene, em kî ne? Hîna me jî wekî Sofiyê xwe nas nekiriye. Sofî xwe diwestîne û li xwe digere, her çiqasî gereke felsefîk be jî, ew dixwaze xwe nas bike. Naxwaze pîrsê bê bersiv bihêle. Lê belê em; em kî ne? Em li xwe digerin? Emê kengî li xwe bigerin? Belkî hinek bibêjin, em însan in, yan jî ji filan neteweyî ne. Navê bavê me ev e, navê diya me ev e... em ji filan derê hatine, li filan cihî dijîn.... Gotînen wisa tenê di nava rûpelên dîrokê de têne nivîsandin. Meqsed ne ev e, pîrs di wê çarçoveyê de ye: Navê jiyana me çî ye? Kengî me dest bi jiyane kir? Emê kengî dest ji jiyane berdî? Çîma me jiyana di nava destên xwe de wekî hêşîrekê girtiye. Em ji jiyane çî dixwazin, jiyana ji me çî dixwaze?

Eger hinek ji me bipîrsin: Hûn kî ne? Emê bi saetan li ser dîrok û qehremaniyên xwe biaxivin... Helbet emê bi serbilindî xwedî li Selahadinê Eyûbî derkevin, kî dikare wî ji dest me bigire! Emê ji wan re Mem û Zînê

bixwînin... Emê îmareten kurdî yek bi yek bînin zîman.. Emê bi bilbilên Feqiyê Teyran re bifirin, bifirin û di nava ewran de wînda bibin, lê belê em çawa dijîn? Û dîsa em kî ne? pîrs di vir de ye.

Em xwe pir azad dihesibînin, di nava azadiyê de tu nemaye ku em bifetîsin. Jiyana me jî li gorî wê azadiya ku em xwe di navê de dibînin, hatiye avakirin. Jiyaneke di nava sînoren mirinê de diçe û tê, li azadiyê digere, dixwaze serbest bibe, ji ber ku me hîna navek li jiyana xwe nekiriye. Em xwe di nava mirinê de zindî dibînin û xwe di nava zincîrên da girkeriyê de jî azad dibînin. Kî qîmetê dide wê azadiya me. Kî wê jiyana me bi mirina xwe dikire? Her tiştê me erzan bûye, jiyana me jî bi qasî mirina xelkên din, ne buha ye. Helbet, eger em ji jiyana xwe bêhtir mirina xwe biparêzin, wê di dawiyê de rewşa me wisa be.

Em kî ne? Çawa dijîn?

Her yek ji me tabloyek e. Lê belê em her yek jî xwe ji yê din baştir dibînin. Çawa? Em ji bo xwe, ji bo jiyana xwe ya ku nikarin ji nava mirinê derxînin, ji bo parastina canê xwe, ji bo jin, zarok, dev, çav, zîman, pişt û zikê xwe dixebitin.. Em ji azadiya mezin ditirsîn, ji ber ku azadiya biçûk di nava azadiya mezin de ye. Di wê azadiya mezin de, em li kêleka xwe hinek kesên din jî dibînin, lewma em naxwazin azadiya me fireh bibe. Em pir ji hev hez nakin. Hezkirin çî ye? Mirov çawa hez dîke, hezkirin kengî dibe nefret, kengî dibe mirin...? Em an nikarin, an jî naxwazin bersivê bidin. Em dixwazin wekî bavê xwe, hez bikin "bijîn", wekî bavê xwe navekî mirî li jiyane bikin, ji ber ku bavê me zindiyên mirî bûn. Wan nikaribû bersiva: "Em kî ne, çîma dijîn?" bidin. Wekî xewnekê hatin û çûn, kesek bi wan nehesiya. Çîma hatin, çîma çûn? Bêguman, ew ne xwediyên wê hêzê bûn ku careke din li vegevin û bijîn.

Eger yek ji me bipîrsê: Di jiyane de tiştê herî baş çî ye? Emê çî bersivê bidin? Wê her yek ji me li gorî hêvî û daxwaza di dilê xwe de bersivê bide. Yê birçî wê bibêje xwarin, yê tî wê bibêje av, yê kor wê bibêje çav, yê ku di dilê keçekê de, yan jî di dilê xortekî de bûye

hêşîr, wê bibêje: Evîn..

Ez gelekî ji pîrsên felsefîk hez nakim. Mirov di nava jiyana û mirinê dimîne; çî ji çî çêbûye..? Piştî mirinê de çî heye? Berî jiyane çî hebûye..? Mirov di nava van pîrsan de gêj dibe. Lê belê rastiyek heye, me çîma hîna navek ji jiyana xwe re nedîtîye? Emê di dawiyê de jiyana xwe de xwe bigihînin ku derê?

Dibêjin jiyana li ser çar tiştan ava bûye: Av, ax, ba, roj. Hemû filozof û pêxember van her çar tiştan pîroz dibînin. Hinek jî dibêjin jiyana ji avê çêbûye. Filozof, di nameya xwe de wê pîrsê ji Sofiyê re şîrove dîke.

Baş e. Madem jiyana li ser van her çar tiştan ava bûye, wê demê "Ax, av, ba û roj" ên me li ku derê ne? Em çiqas diparêzin û xwedî lê derdikevin? Li aliyekî dijmin ava me ji xwe kiriye petrol, li aliyekî bayê di ezmanê welatê me de bûye jehr û di rehmen dayîkan de, nefesê li zarokên me dibire, li aliyê din jî li ser her gaveke axa welat goristanek û canazeyê însanekî heye. Li welêt li me qedexeyê ku roj xwe ji nava pêşîrên şevê derxîne û bibêje: Rojbaş, însan! Jiyana ji dest me hatiye girtin.

Navê jiyana me çî ye?

Eger her yek ji me bibe Sofî û bi israr bixwaze bersiva pîrsan bide, wê demê emê bikaribin navekî ji navê mirî dîr ji jiyana xwe re bibînin. Dema ku me jiyana bi dest xwe ve anî, hingê em xwe nas dikin. Û bersiva pîrsa "em kî ne? em çawa dijîn?" tê dayîn. Emê hem xwe nas bikin, hem jî bizanibin jiyane hîlbijêrin. Wekî din azadiyên biçûk nikarin ji rojê re sînga ezmanan biçîrînin û miriyên di goran de hişyar bikin. Heya ku miriyên me yên di gorê de devê goran neqelîşînin û nebêjin "me jî jiyaneke wisa dixwest" em her wînda û bênav himînin. Ev jî girêdayî jiyana me ye, girêdayî ax, av, ba û azadiya roja di devê ezmanan de ye. Di destê me de ye, ji ber ku berî her tiştî em dixwazin bibin însan. Însan jî, xwediyê wê hêzê ye ku her tiştî bike, dikare.

# Pira Siratê li ber me ye



## M. HEMO

"Di sala 1961'ê de ez li gundê Şitika bi ber roniyê ketim. Şitika gundek e wekî sêsed û şêst û şeş gundên Çiyayê Kurmênc ku di nav xemla Çiyê de, li Çiyayê Xwestiya di nav xunava sibê de tê veşartin û bi 20 km'yî li dûrî bajarê Efrîna rengîn dikeve. Min neh salan xwendin li gundê derdora Şitika kir û salekê li bajarê Helebê. Min du salan karê çandinê di gel bavê xwe kir, şeş salan ez li bajarê Helebê xebitîm. Du salan min li Lîbyayê kar kir û ev çar sal in min pirtûkxaneyek bi navê Bedirxan li bajarê Helebê vekirîye. Nîvsalê ji bo firotana pirtûkên kurdî ez xistim zîndanê."

**L**i Helebê xwediyê pirtûkxaneya Bedirxan e, M. Hemo. Ew digel vê yekê bi wêjevaniyê ji dadikeve û endamê Koma Xanî ye ji. Ew dide xuyakirin ku pirsra çimayê ew xistiye ser riya çandî û doza kurdî. Ji vê pê ve em jê guhdarî bikin.

### Helbestvaniya min

Ez bi xwe, sedî sed nizanîm çawa ez bûm helbestvan. Lê di biçûkiya min de, temenê min çar-pênc sal bû, dê û bavê min ez digel xwe birim bajarê Helebê, bûn mêvanên hin dostên xwe yên ereb. Gava min dît zarokînan wê malê ciwan hene û listikînan zarokan ên xweşik hene, min xwest ez tevî wan bilîzim. Ez bi wan re axivîm, wan bi zimanê min nedizani, ez gelek xeyidîm û min da girî, bavê min got:

"Xwe hînî zimanê wan bike ji bo ku tu bi wan re bipeyivî. Min ji bavê xwe pirsî: Çima ew xwe hînî zimanê me nakin?"

Bavê min got: "Tu hatî ba wan, ne ew hatine ba te."

Ez pê bawer bûm. Havînekê min bi-hîst ewê jî bibin mêvanê me, ez gelek kêfxweş bûm min got, vê carê ew wekî min bipeyivin û emê bi hev re bilîzin, gava ew hatin li bin dareke gûzê ji trumpelê peya bûn, ez beziyam pêsiya zarokan. Ez bi wan re peyivîm min dît dîsa ew bi zimanê xwe peyivîn. Min ji bavê xwe re got ew dîsa bi min re napeyivin.

Bavê min got:

"Kengê tu hîn bûyî zimanê erebî, tu-ye li tev wan bipeyivî."

Min got: "Çima ew xwe hîn nakin

zimanê kurmançî?"

Bavê min got: Hikûmet' ereb e."

Min pirsî: "Çima hikûmet ereb e?"

Û ji wê rojê ve min daye dû çimayê.

Her ku çimayê ez berhembêz dikim, deh çimayên nû ji ber min direvin û ji wê rojê de helbest di dilê min de tîn ristin. Ta gilok bi serî bûn, min tewna xwe li dar hişt.

### Sedema girtina min

Sedema ku ez pê hatim girtin, pirtûkxaneya min bû. Çawa ez girtim, pirtûkên pirtûkxaneya min ji birin. Ew ne cara yekê bû ku ez dihatim girtin, berî wê bi pênc mehan pêşangeha pirtûkên

**Sed nod û pênc rojan ez di zîndanê de mam, sed nod û pênc caran min kurdîtiya xwe vedijiyand, ji ber ku min dizanî ez ji ber karekî ketime zîndanê. Gava karê mirov birûmet be, zîdana wî jî wê birûmet be, kuştina wî jî wê birûmet be, mandina wî jî wê birûmet be. Min digot ji me ditirsin, me digirin, mafir ji me ditirsin, em hene.**

min jî girtin û dîsa pirtûk birin.

Şeva Newroza 1986'an ez li bajarê Helebê girtim û roja Newroza 1987'an ez di konsera Newrozê de girtim û li nêzikî bajarê Efrînê ew jî, ji bo pêşkêşî ya şanoyekê bû.

Lê ew tev ne riyên girtinê ne, yên xelkê tîn girtin yan bikuj in an diz in an efyonkêş û afyonfiroş in, lê ya me kurdan karin me bigirin ji ber ku em kurd in.

Min gelek kurd di zîndanê de dît in yekî ji wan pasaporta xwe wînda kiribû, xwestibû ji nû ve çêbike, doza wî tevî doza siyasiyan kiribûn û digotin:

"Te pasaporta xwe daye PKK'ê."

Dizek girtibûn, bavê wî ne kurd bû, diya wî kurd bû doza wî jî tevî doza siyasiyan kiribûn, digotin:

"Pereyên ku te dizîne te ji PKK'ê re bi rê kirine."

Trumpelêkê li gundên nêzikî sinorê Tirkîyeyê keçikek bi xwe re rakiribû, piştî demekê xwediyê trumpelê xwestin, û gotin:

"Filan rojê te keçikek gihand sinorê Tirkîyeyê û te spart PKK'ê."

Ev kurdên ku ji tirsan xwe ji hemû karên welatparêziyê dûr dixin, qaşo xwe diparêzin, lê ew şaş in, ya me kurdan meseleya "Ga jî bi kêlê ye, golek

jî bi kêlê ye."

Sed û nod û pênc rojan ez di zîndanê de mam, sed û nod û pênc caran min kurdîtiya xwe vedijiyand, ji ber ku min dizanî ez ji ber karekî ketime zîndanê. Gava karê mirov birûmet be, zîdana wî jî wê birûmet be, kuştina wî jî wê birûmet be, mandina wî jî wê birûmet be. Min digot ji me ditirsin, me digirin, mafir ji me ditirsin, em hene.

### Ez ji Koma Xanî me

Ev kom me di sala 1988'an de damezirand. Di wê hingê de wêjeya kurdî di nav astengiyê mezin de bû, pir zor

bû ta pirtûkeke bi kurdî bi destê mirov biketa. Heşt diwanên Cegerxwîn çap bûbûn. Ji du milyon kurdên li Suriyeyê dused kesî diwanên wî tev nedîtibûn. Wê hingê me çend çaran ji partiyên re digot ku divê ew komîteyên çandî ava bikin. Wan guh li me nedikirin.

Di sala 1988'an de min afirandinek(berhemek) li ser dîroka wêjeya kurdî amade kir û bi alîkariya hin xortên Koma Armanc a hunerî me vexwendname ji rewşenbîrên kurd re li bajare Helebê bi rê kirin. Di şeva 14'ê adara 1988'an de min ew afirandina li ser dîroka wêjeya kurdî di şevbuhêrkê de pêşkêş kir.

Berî ku ez dest bi xwendina afirandinê bikim, min got ku armanca min jî vê şevbuhêrkê ew e ku em rewşenbîr karibin komîteyek wêje û çanda kurdî ava bikin. Wan rewşenbîran tevan dengê xwe dan me, sozek danî piştî bîst û pênc rojan me ev kom damezirand.

Di wê hingê de her meh, me du civîn çêdikirin, yek em rewşenbîr li hev rûdiniştin û me berhemên xwe ji hev re dixwendin û civîna din şevbuhêrk bûn, çî ji helbestan, çî jî çîrokên, çî jî afirandinên wêjeyî û çandî bûn. Wekî din jî pirtûkek ji ku bihata me fotokopî dikir, li hev belav dikir û li millet jî belav dikir; wekî din jî me hin waneyên (ders) hînbûna rêzimana kurdî vekirin.

### Rola ku

#### Koma Ehmedê Xanî list

Di wan rojên ku kesekî newêribû pirtûkeke bi kurdî rakira, me bi sedan pirtûk belav dikirin. Cara pêşîn Koma Xanî şevbuhêrkeke wêjeyî û çandî li Suriyê



● **16.11.1994:** Li qereqola Gazî Osmanpaşaya Stenbolê kesek bi navê Bayram Duran di bin çav de hate kuştin. Li ser vê bûyerê gelê ku li Gaziyê rûdine, kirinên qereqolê protesto kirin.

● **17.11.1994:** Li ser nûçeyê ajansa AFP'ê ku li Tirkîyeyê leşker gundê kurdan dişewitînin, Amerîkayê daxuyanîyek da dewleta tirk û xwest ku gund neyên şewitandin. Li ser vê daxuyanîyê Wezîrê Karê Mafên Mirovan Azîmet Köylüoğlu îtiraf kir ku leşker gundan dişewitînin. Serokwezîr Tansu Çiller jî pêşî got ku PKK'yan cilên leşkeran li xwe kirine û gund şewitandine, piştê jî îdia kir ku

firokeyên PKK'ê gundên kurdan şewitandine.

● **Kewçer 1994:** Weqfa Hîroştmayê (ev weqf li hemberî şer û çekên kimyewî ye) xelat (30 hezar dolar) da nivîskarê tirk Azîz Nesin. Ji ber ku di nav du gelan de doza aştiyê dike û germahiya şer kêmtir dike.

● **19.11.1960:** Dewleta tirk li hemberî kurdan zagoneke (qanûn) sirgûnê ya nû çêkir. Ev zagon jî wekî zagonên salên 1925'an bû û berdewama wan bû. Kesên ku doza kurdîtiyê dikirin jî aliyê dewletê ve ji axa xwe dihatin bidûrxistin.

## AWIR

**Divê em bizav bikin ku ew nivîskarên kurd ên ku bi zimanên biyan dinivîsin bi kurdî binivîsin an em pirtûkên wan wergerînin kurdî, ji ber ku canê kurdîtiyê di dahûranên wan de têne dîtin. Wek pirtûkên Yaşar Kemal, Selîm Berekat.**

li dar xist. Me dersên hînbûna zimên û rêziman vekirin. Di sala 1993'yan de Koma Xanî festîvala helbesta kurdî li dar xist. Di sala 1993'yan de me festîvala helbesta kurdî li Suriyeyê damezrand. Di sala 1994 û 1995'an de Koma Xanî pêşbaziyan kurteçirokên kurdî li dar xist.

### Pirtûkxaneyê Bedirxan

Di vê dema niha de qelsbûn ketiye kirîna pirtûkan, ew qelsbûn jî encama pir tiştan e. Rewşa aborî li ba me ne baş e; partiyên kurd berê hevalên xwe nadin riya rewşenbîriyê, qaser didin riya siyaseta plan û pevçûnê; tirs hîn ji dilê gelê me derketiye ku pirtûka kurdî serbest bikin. Tiştê tevan girîng hîn tu nivîskar xwe ber nedaye dilê millet ku millet li benda berhemên wî bimîne. Wekî minak Şivan Perwer. Divê çî nivîskar, çî helbestvan û çî hunermend xwe berde dilê gelê xwe, ta ew jî karibe xwe di dilê gelê xwe de bide jiyandin.

### Gelê kurd hez ji dîroka xwe dike

Bêhtir pirtûkên dîroka kurdî ya kevn tînin xwestin. Ez dibînim gelê me ji dîroka xwe ya kevn a jî berî zayînê hez kiriye, ji ber ku tiştê ku kurd karibin serê xwe pê hildin ew dîroka me ya kevin e, ên din pirtûkên hînbûna ziman, rêziman, ferheng; ew jî baş têne firotan.

Astenga mezin kirin, firotin û çapkirina pirtûkên bi kurdî li vir ne serbest in, gava bixwazin yekî bigirin, pirtûkan dikin hincet.

### Bi çêşnên wêjeyî jî dadikevim

Di warê wêjeyî de min gelek şano di salên heştêyî de nivîsandin hîn ji wan hatin pêşkêşkirin, lê neketin çapxaneyan, ji bilî Civata Kulîlkan; ew şanoyeke zarokan e, di sala 1994'an de jê hezar heb hatin çapkirin. Min kurteçirok nivîsandine di pêşbaziya kurteçiroka kurdî de ku sala 1995'an Koma Xanî li dar xist, xelateke Xanî bû para min, li ser kurteçiroka bi navê "Hêstir".

Wekî din jî min helbest gelek nivîsandin e, berhevoeke min a helbestan bi navê "Seyrana dil" li ber çapê ye.

### Asteng li pêşiya me ye

Pêşeroja weşanên pirtûkên kurdî li

ber Pira Siratê ye, piştî ku çîşeya sosyalîstan ji ber hev ket, di bin siya Pergala Cihanê ya Nû de pir guhertin di cihanê de çêbûn, lê para me di wan guhertinan de qels bû. Tiştê yekem serbestiya çapa kurdî li Tirkîyeyê, hikûmeta ku kurdan ava kir li Kurdistanê Başûr, li Sûriyê rê nedan çapa kurdî lê rê negirtin jî.

Gava wiha bû, nivîskarên me yê avîs û ne avîs xwestin bizên; pirtûkên xwe çap kirin. Me dît gelek berhemên beravêti di pirtûkxaneyan de hene. Gelê me ji şabûna re xwest wan berhemên di kûzê mêtinê de xwedî bike, ji ber ku nemirin, lê nikarin. Tiştê mirî can pê nayê, gelek pirtûk ji helbestan ketin destê me, me dixwendin piştî saetekê tiştê jê nedihat bîra mirovan, çimkî xwe bernedidan canê mirovan û hin helbestvan ji wan, me didîtin û me dipirsîn çî merema te ji filan malikê yan helbestê heye, nizanin an jî li her cihekî bi rengê digotin.

Gavê mirov ji şirovekirina malikeke helbestê aciz dibe, dibêje maneya wê di dilê helbestvan de ye, lê em dibînin helbestvanin hene bi xwe nivîsandine, nizanin çî dixwazin û çî dane.

Li Başûrê Biçûk ji sala 1991'ê heta 1996'an 115 pirtûkên kurdî çap bûne, bi kurdî û erebî texmîn, ji wan 54 bi kurdî ne, jê 24 helbest in, çend helbestvan ji wan xwe berdane dilê gelê xwe û xwe di meydana çandî de dane nasîn. Ew demeke wiha bû, çû lê ji vir û pê ve di vê her pirtûka ku têkeve pirtûkxaneyê bi bêjînga rexnegiran bê bêtin.


Divê em bizav bikin ku ew nivîskarên kurd ên ku bi zimanên biyan dinivîsin bi kurdî binivîsin an em pirtûkên wan wergerînin kurdî, ji ber ku canê kurdîtiyê di dahûranên wan de têne dîtin. Wek pirtûkên Yaşar Kemal, Selîm Berekat. Wê hingê em karin wan rewşenbîrên me yê panzdeh bîst salan bi zimanê biyanî xwendine bêşer û fedî dibêjin, "Em nizanin bi kurdî bixwînin", vegeînin, ew jî bi kurdî bixwînin.

Eger ew kar bibe, pirtûkxaneyê me jî wê wekî pirtûkxaneyê miletên din bibe û pêşeroja weşana kurdî wê karibe bi xweşî di ser 'Pira Siratê' re derbas bibe.

AMADEKAR: JAN DOST

## ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YÎÇÎT



### Stratejiya neteweyî

(1)

Ev çend meh in li bajarê Stockholmê semînerê li pey ya din tê kirin. Heftêya ku semînerê û du semîner li aliyekî Stockholmê çênebin tune. Piraniya van semîneran jî li ser başûrê Kurdistanê û rewşa gelê kurd li vî parçeyê welat in. Semînerê jî van jî ku roja 29'ê meha rezberê hate lidarxistin, li dora çend xalên mîna rewşa civakî û stratejiya neteweyî bû.

Em jî di vê meqaleyê de dikarin hinekî li ser vê pîrsê bisekinin. Gava ku mirov bala xwe dide dîroka neteweyên modern û ber bi roja hazir de tî, mirov bi meyleke giştî re rû bi rû dibe. Ev meyl ew e ku berê neteweyan li dewletbûyinê ye. Daxwaz û hewla avakirina dewleta neteweyî di karakterê her neteweyî de heye.

Neteweya dewletê nexwaze, di dilê wî de dewlet tune teqez balix nebûye, neteweyîbûna wî dikeve bin şikê û bi awayekî belexwurtî bûye. Bala xwe bidin 207 salên dawî ji dîroka dinyayê, hinekî pelên van salan biqulibînin, hûn dê bibînin ku ewil li Ewropayê bi dû re li Amerîkaya Latînî, hê bi dû re jî li Asya û li Afrîqayê û dawî berî bi çend salan li Baltîk, li Kafkasya û li Sovyeta Kevin netewe bûne dewlet û merkezên neteweyî.

Şik û guman tî de tune ku neteweya kurd jî dewletê dixwaze. Ev daxwazê meşrû ye, li cih û heq e. Lê mesele ne ev tenê ye, bi vê naqede. Pîrseke duyem jî heye. Ew jî ev e: Çima kurd nebûn dewlet, çima nabin dewlet û pîrseke din: Sûcê kê ye, em dê bi qirika kê bigirin. Em dê bi pîsêr û zengeloka kê bigirin. Gunehkar kî ne, tawanbar kî ne? Îro ev pîrs bûne pîrsên serekî. Welatêz û welatparêzên kurd jî her gavê zêdetir van pîrsan dikin.

Hişyarî û hişmendîya neteweyî ku tevgera rizgarîxwaz û serokayetiya wê jê re bûye mîjî û motor, van pîrsan dipirse û bersiva wan dixwaze. Belê, divê sebebên cidî û mezin hebin ji bo vê rewşê û îstîsnaya nenormal, ji bo vê qeydeya şaz û ecêb. Ger û hewla bersivdayîna van pîrsan me tîne ser stratejiya neteweyî.

Pîrsa stratejiya neteweyî jî du alîyan ve me dide fikirandin û bi du awayan me diponijîne: Ya yekê pîrsgirêka stratejiya neteweyî bi kêmanî ji Şoreşa Fransa û vir de ev zêdeyî 200 salî ye ne bi tenê ketiye nav edebiyat û ferhenga siyasî, belê her wiha li ser bîngeha stratejiya neteweyî zêdeyî 180 netewe bûne dewlet. Tiştê duyem ku pîrsa stratejiya neteweyî tîne bîra mirov, rewşa siyaseta û serokên Başûr e. Balkêş û hêjayî gotinê ye ku heta niha jî siyaseta û serokayetiya siyasî pêşî li Başûr û piştê jî li Rojhilat hê nebûne xwediyê stratejiyêke neteweyî û ewqas sal in bê stratejiyêke neteweyî şer dikin, xwîne dirijînin û çî dikin, çî dixwazin ne diyar e. Ev nediyarî jî sebeb û dayîka giş tirajedî, binketin û malkambaxiyên îro ye. Heta bêstratejiyê hebe, heta em li Başûr û li Rojhilat jî nebin xwediyê stratejiyêke neteweyî, dê rewşa me li van parçeyan baştir nebe û siyaseta û serokatîyên vir dê ne bi tenê ji gelê me re li wan parçeyan, belê dê bi giştî ji bo Kurdistanê û gelê kurd jî tim zerardar bin.

Em pîrsên xwe bidomînin û em bipirsîn stratejiya neteweyî çî ye? Çî ye ev tiştê ku ewqas îş jê xerab dibe û qedera me pê ve hatiye girêdan. Em bi du şiklan karin bersiva vê pîrsê bidin û bi du awayan tarîf bikin. Ya yekê di çarçoveyêke teng û sînorkirî de em ji bo stratejiya neteweyî karin bibêjin siyaseta neteweyî. Ya duyem di çarçoveyêke firehtir de stratejiya neteweyî yanî giş amadeyiyên îdeolojîkî, siyasî, rêxistinî, eskerî, perwerdekarî û diplomatîkî jî bo hedefa tevayî û neteweyî. Hedefa tevayî û neteweyî jî dewlet e, dewleteke kurdî ye. Netewe giş karî û hêza xwe dixwe xizmeta ve hedefê û ji bo vê hedefê seferber dibe. Stratejî ango siyaseta neteweyî dibe çek, organ mekanîzme, motor û mîjîyê ve seferberiyê, nav û nişana muştêrek. Bi awayekî din jî mirov dikare bêje ku stratejiya neteweyî giş ew plan, proje, metod, rê û wasite ne ku mirov digihînin hedefê.

# Gerek mirov bûyeran bi hunerî bihone

**Brader, wekî gelek kesan mecbûr maye li xerbiyê xebata xwe ya hunerî bidomîne, ji welêt dûr û li ser welêt... EKREM DEMIR ku xebatkarekî radyoya bajarên Duisburg û Essenê ye, di mêtûyê 30.08.1996'an de hevpeyvînek digel hunermend pêk anî û piştê ji me re şand. Em jî vê hevpeyvînekê ku ji naveroka xwe tiştêk winda nekiriye pêşkêş dikin.**

**H**ûn xebatên xwe li ser kîjan bingehê didomînin? Çi şewq û îlham dide we ku ji welat ev qas dûr hûn karê hunerî pêk tînin?

● Ji bo însanekî hunermend ku cewherê hunerî pê re hebe, îlhama xwe dikare ji her tiştî bistîne. Bes ev derece derece ye, hunermendek kare wexta roj here ava îlhamekê bistîne, bingeha huner bistîne, wexta ku roj derkeve, wexta ku gulek aj bide û biçilmise.


Lê taybetiyek me heye: Em îlhama xwe ji rewşa welatê xwe distînin. Welatê ku hezar sale bindest e, lê şer e, mirin e, girtin e, birçibûn e, koçberî ye; ew giş îlhamê didin me. Lê hunermendên me yê derveyî welat bivê nevwê jî vê jî para xwe kêr distîne, ji ber ku ne di nav de ye, yanê îlhamê îndîrekt distîne. Ev jî ji bo me tade ye, zor e, problemeke bi serê xwe ye.

*Li Ewropayê yekîtîya hunermendan heye? Dîtinên we li ser vê yekê çi ne?*

● Yekîtîya hunermendan îro ez nikarim bibêjim heye. Gavin tîn avêtin, gavin hatin avêtin, ez bi xwe jî di nav de bûm. Mesela sala derbasbûyî ji bo avakirina yekîtîya hunermendan bi reya Akademiya Kurdî gavek hate avêtin. Konferansek çêbû, lê têrî nake mixabin. Ji ber ku rewşa me hunermendên kurdan aliyê mêtî heye, hem yê cografîk heye, hem yê madî heye.

Îro wexta organek wek Akademiya Kurdî rabe û karibe hemû hunermendan di bin banekî de bicivîne, ji bo wê jî îmkân lazim in; îmkânên madî lazim in, yê lojîstîk lazim in. Ji bo hunermendan jî ev yek heye. Li aliyê din hunermend ji bo wextê werin cem hev, divê serbixwe bifikire û li dora tiştine musterek bînin cem hev.

Ev jî ez bawer im, di rojekê, du rojan de çênabe. Bi pêvajoyê, bi xebatê û li gorî şertên me û welat ancax pêk bê. Lê pengav hene, hatine avêtin; ez bi xwe jî piştigirîya vê yekîtîyê dikim.



**H**in tişt hene, sembol in. Gerek mirov wan neke slogan. Ev awayê min ê hunerî ye. Ji serê stranê heya binê stranê bibêjî gerîla, gelek hene ku kêfa wan wê pir bê. Lê ev hunera me bi pêş naxe. Gerek mirov bûyeran bi hunerî bihone û bide gelê xwe.

*Niha mijareke pir germ heye. Li Başûrê Kurdistanê şerê navxweyî-birakujî dom dike. Dîtinên we der heqê birakujîyê de çi ne û ev şerê nav kurdan çi bandor wekî hunermendekî li ser we dihêle?*

● Navê wê birakujî ye. Kesek nikare şerê birakujîyê mafdar derxe. Sebeb çî dibe bila bibe; di şerê birakujîyê de tu aliyê heq tune ye. Her du alî jî neheq in; sê alî be her sê alî, çar alî be, her çar alî jî neheq in.

Em hunermend jî wexta şerê birakujîyê tê holê, koka tembûra me sist dibe, destê me lê sar dibe, em gelekî xemgîn dibin. Mesela ez vayê ji du salan ve di çarêzekî de bang dikim. Êdî hêviya min

dabe. Her gav bangî min kirin, ez çûm, min alîkarî kir, kilamên xwe pêşkêş kirin, wekî Brader. Min wê çaxê jî got:

Ev fersendeke tarîxî ye ketiyê destê me kurdan, lê mixabin dijmin nesekîni heya jê hat bi awayekî MED-TV da girtin. Ew cara duduyan hat, dema cara ewil derket dijmin bi carekê kuşt, niha du caran kuştîye. Serfiraziyeke mezin e ji bo miletê kurd. Her mirovê kurd, ne tenê hunermend, hemû rêxistin, partiyên kurd gerek e alîkarî bike û alîkariyê jê bistîne. Em pê kêfxweş in.

*Di nava salekê de bi dîtina we kîjan kêmasiyên televîzyonê çêbûn? Rexneyên we li Televîzyonê hene?*

● Tu bivê nevwê wexta televîzyonek hebe, radyoyek hebe li gel kirinên wê yê pozîtîf yê negatîf jî wê hebin. Lê ez bawer im tiştên negatîf ne bi zanebûn in her gavê. Ji ber ku ev televîzyon gerekê bi pêş bikeve. Yê bi zanebûn kêmasiyên bike, dêmek naxwaze bi pêş bikeve, bes îllec wê kêmasî çêbibin.

Wexta mirov kêmasî anîn ser ziman, bi awayekî piştigirî –bi tirkî dibêjin yapıcı– gerek rexne bike. Rexneyên min bi xwe hene. Gava ez diçim televîzyonê ez jî wan re jî dibêjim. Di aliyê teknîkê de, di aliyê hunerî de, heta heta di aliyê siyasî de jî kêmasî hene. Îro dengê kurdan a medyatîk heye, ew jî MED-TV ye. Alîkariyê jî ku derê bistîne bila bistîne, ew malê gel e, ew çiqas bibe malê gel, ên alîkariyê dikin jî ew qas wê bibin malê gel. Ji bo ku bibin malê gel, divê daxwazên gel bînin ber çavan.

Em bibêjin partiyên me hene, rêxistinên me yê din hene, çiqas biçûk bin jî rê bidine wan, bila bînin fikrên xwe bibêjin, platforman vekin, nîqaş bikin, her kes fikrên xwe bibêje, ji bo milet îmkânê e. Di wî alî de di aliyê platforman de, di aliyê gotûbêjan de ez kêmasiyên dibînim. Wekî din di aliyê hunerî de gerek gotûbêj çêbibin. Berî ku bê girtin dest pê bûbû, ez hêvîdar im wê jî berê çêtir ekranê vekin.

Her kes divê piştigirîya MED-TV bike û piştigirîyê jê bistîne. Dest destan dişo, vedigere ser çavan dişo. Wexta ez diçim MED-TV'yê, ez alîkariyê dikim, lê li aliyê din MED-TV jî alîkariya min dike. Min digihîne miletê min, muzîka min bi pêş dikeve, êdî dikarim li ber kamerayê biştrim, ji berê profesyonel-tir bibim. Hunermendên me hene berî MED-TV derkeve, hê li ber kamerayê nestrabûn, ev jî bo wan îmkâneke bû.

Kozîka MED-TV mektebek hunerî ye, gerek bibe mektebeke siyasî û çandî.

*We di helbestekê de digot "ka heva-*

ji zilamên kurdan nemaye, ji bo ku şerê birakujîyê bisekinînin. Ji ber ku ji berê ve di tarîxa kurdan de jinan her gavê şer sekinandiye, destmialên xwe avêtine ser mîrkujan, çûne ser kozîkên mîrkujan ji bo şer bisekin. Ez bang dikim, dibêjim:

*Xanimê dest rake/ Bo yekîtî û tifaq e Ji nava me kurdan/ Birakujîyê rake.*

*Di 15'ê gelawêja 1996'an de MED-TV cara duyemîn dest bi weşanê kir. Hatina televîzyonê cara duyemîn hûn çawa dinirxînin?*

● Destpêka MED-TV'yê, wexta derket wek her kurdî kêfa min jî hat. Ez bawer nakim, ji xeynî hunermendên Hunerkomê kesî berî min piştigirî nîşan

lên sosyalist, ka çîna karker û ka mirovahi". Hûn dikarin hinekî vekin?

● Berî 1980'yî rêxistinên me digotin yekîtiya gelan, hêza karkeran û bloka sosyalist. Sê hêzên mezin hebûn ji bo piştigiriya gelên bindest. Di dema tevkujiya Helepçeyê de û wê dema piştî Helepçeyê qonaxa ku dest pê kir û heya îro insanên me bi milyonan koçber bûn, çûn Kurdistanê Bakur. Di wir de hêzên sosyalist ên cîhanê bédeng man, heta hinek jî wek Fidel Castro û rayedarên Çînê bi awayekî vekirî ku ew li hemberî Amerîkayê bûn jî, alîkariya Saddam kirin, destê xwe dirêji wî kirin.

Me digot hêzên sosyalist qeweta me ya sisiyan in, di meseleya kurdî de bédeng man. Tu li hemberî împeryalizmê bî, çawa tuyê li hemberî gelê bindest bî. Li hemberî kurdan Saddam û Amerîka danîn kêleka hev û terciha xwe ji bo yekî kirin, ji kurdan re nekirin. Ji ber wî hawî dibêjim ka hêzên sosyalist. Hêzên karker jî tiştê nekirin. Jixwe hêzêk ne xurt bû. Arîstokrasiya karkeran hebû. Gelên bindest jî. Me tu alîkarî ji kesekî nedît. Wekî gazin min gotiye.

*Bi piranî mamostetî, pêşmergetî û peyvên militano derdikevin pêş. Gelo we çima li ser gerîlayan heyani vêga stran yan jî helbestek negotiye? Şervanên bakurê Kurdistanê xwe wek gerîla bi nav dikin.*

● Ji bo min pêşmerge û gerîla yek in. Gerîla peyveke înternasyonalî ye, me bi tirkî bihist, tirkan jî ji zimanekî din bihistine. Eslê xwe bi kurdî pêşmerge ye. Wexta mirov got pêşmerge, ew gerîla ye. Pêşmerge semboleke kurdî ye, yên ji bo kurdan şer dikin hemû pêşmerge ne. Ji bo min tu jî îro pêşmerge yî, ji ber ku ji bo kurdan karekî dikî. Ez jî xwe wekî pêşmergeyekî dibînim.

Her kes di meydana xwe de, li gorî îmkânên xwe pêşmerge ye an jî bi navê din gerîla ye. Lê ji bo ku ez vê bersivê bidim, min helbesteke din çêkiriye, yanê ne ku ez çêdikim, helbest çêdibin: "Ez şehîdekî bēnav im." Ew li gorî kanaeta min hemû şehîdên Kurdistanê tîne ziman. Şehîdên li Zîndana Diyarbekirê xwe şewitandine, yên agir li xwe pêçane, yên li serê Çiyayê Agirî namlüyên wan çiriyane, yên bi 33 guleyan hatine şehîdkirin, yên Mehabadê, yên Helepçeyê, yên Sinemaya Amûdê. Ez wan gişan bi wî awayî tînim ziman. Helbest, stran, huner ne armanc in, hacet in li gorî min. Hîsên insanên dibin hacet, tiştêk tê ziman, tu wê îcra dikî û didî gelê xwe; gel jî mesajan jê derdixe. Yanê tu ji wî distîni û dîsa didî wî. Eger şehîdên Mehabad û Helepçeyê çenebûna, minê çawa li ser wan bigota?

Hin tişt hene, simbol in. Gerek mirov wan neke slogan. Ev awayê min ê hunerî ye. Îro gelek simbol hene, serê stranê heya binê stranê bibêji gerîla, gelek hore kêfa wan wê pir bê. Lê ev hunera me bi pêş naxe. Gerek mirov bûyeran bi hunerî bihone û bide gelê xwe. Wek bûye tu bêji, dibe wekî rojname. Ji xwe gel berê bihistiye, bi riya radyo û televîzyonan, tu bi eynî hawî bibêji, ew nabe huner, gerek tu bi awayekî mecaz, bi awayekî dramatik bidî gel.



*Li bakurê Kurdistanê tevgerê heye û ji dozdeh salan û vir de li hemberî dewleta dagirker di nava şer de ye. Wekî hunermendekî hûn PKK'ê çawa dinirxînin?*

● Ez wekî hunermendekî, wekî kurdîkî vê hereketê wiha dibînim: Ev tevgera ku di 15'ê gelawêja 1984'an de dest pê kiriye dūmahîk e, gavek di şûnê de ye, gavek bêhempa ye, bes ne ewil e; dūmahîka gavên berê ya Şêx Seîd, Seyîd Rîza û Nûrî Dersîmî ye. Bes li gorî dema xwe, wexta mirov gavên ni-

**K**esek nikare şerê birakujiyê mafdar derxe. Sebeb çî dibe, bila bibe; di şerê birakujiyê de tu aliyê heq tune ye. Em hunermend jî wexta şerê birakujiyê tê holê, koka tembûra me sist dibe, destê me lê sar dibe, em gelekî xemgîn dibin.

ha û berî niha 15-20 salî, 30 salî bîne ber hev, bivê nevwê wê ferq hebe. Îmkânên wê bêhtir in, potansiyela wê bêhtir e, muhakak wekî em kurd giş hevî dikin, serkeftina wê jî, wê hê bêhtir be.

Ez wekî insanekî kurd piştigiriya wê dikim, gerek hîn pêştir here. Ji min re sosyalist bin, nijadperest bin, burjûvazî bin, di roja îro de zêde ne girîng e. Mesele pêş bikeve. Qulp ketiye destê me kurdan, gerek ji destên me nekeve. Piştî welatê me xelas bû, her kes kare kumê xwe li ber xwe deyne, bifikire û ca-

reke din li hemberî hev nîqaşê bike, mucadele bike. Ez wer dibînim.

*Demekê we di televîzyona Medê de gotibû, gerek muzîka kurdî derkeve bazara dinyayê, bikeve nava wan û xwe bide naskirin û qebûlkirin....*

● Îro di şertên dinyayê de muzîk bûye materyal. Ji aliyekî ve materyal e, pere ye; ji aliyekî ve manewiyat e. Ji bo me aliyê gelekî muhîm, manewiyat e. Îro di şertên dinyayê de ev manewiyat bê madiyat nameşe. Ji bo ku em vê madiyatê pêk bînin, ez ne şexsî dibêjim, bi gelemperî ji bo kumuzîka kurdî bi pêş-

bikeve, ji bo ku em karibin mektebên muzîkê vekin, yekîtiyan li dar bixin, ji bo ku em karibin karên mezin bikin, gerek em karibin muzîka xwe tîxin bin kontrolê. Ku me xist bin kontrolê, em karibin bazar bikin. Yanê bazar ne di maneya firotinê de ye, bazar mihafaza dike. Yanê em bibêjin îro li Stenbolê Unkapani, li wir tê firotin; lê mihafaza nabin. Muzîkvan, hunermend ji berhemên xwe feyde nagire. Xelk distîne, çar çûr dike, difiroşe, pere qezenc dike û bi erdê de berdide. Lê wextê ev bi

## BIRADER MUSÎKÎ

"Bavê min dengbêj bû, ez hê di biçûkiya xwe de ji wî hîni stranbêji û dengbêjiyê bûm.

Di salên 1970 û 1975'an de ez hîni tembûrê bûm. Piştî 1980'yî min dest bi karê profesyonelî yê muzîkê kir, ji ber ku berî 1980'yî min dixwend. Min nikarî wextê xwe jî bidimê, şertên welêt jî zêde ne musaît bûn ku yekî xwendevan karibe muzîka kurdî bi awayekî profesyonel pêk bîne. Ez ji gundê Musîka, ji herêma nêzî Mêrdînê me. Heya sala 1979, 1980'yî min mekteba ewil, navîn û lîseyaya tenduristî ya di tengaya lîseyê re xwend. Piştî ku ez sirgûn bûm, min jî dev ji mektebê berda. Piştî 86'an ez derketim Ewropayê û vir de ez li welatê Hollandayê, li bajarê Arnheimê dimînim û ez karê muzîka kurdî pêk tînim."

destê kurdan çêbibe, mesela, li Ewropayê îmkânên me hene, em dikarin çêbikin, wekî awayê komeleyekê berhemên muzîkê em çêbikin, CD derket, yek dixwaze CD derxe bi destêkî derkeve, di bin kontrolê de, ji bo ku ew CD û kaset wîndî jî nebin, kî zanibe ya kê ye, kîjan berhem a kê ye, muzîk ji ku aniye, teks ji ku aniye, mafê wî biparêze û bi bazara dinyayê re, bi muzîka dinyayê re karibe bimeşe.

Îro em çiqas berhemên xweşik çêbikin, wextê dinya pê nebihîze tîrên nake. Mesela îro komeke Hollandî heye dixwaze stranên min bi Îngilîzî bibêje. Ev strana min dikeve bazara dinyayê, ne di maneya pereyan tenê de. Ev ji bo min serkeftinek e. Wextê stranên kurdî bi Îngilîzî bîn gotin, meşhûr bibin, bîne naskirin, ka ev stran ji ku hatiye, xwediyê wê yekî kurd e, wê teki-liyên me di nav muzîkvanan de çêbînin, emê werine naskirin, muzîka me jî wê bi pêş bikeve.

*Xebatên we yên nû hene? Heya niha çend kasetên we derketine?*

● Ez niha li ser kaseteke nû kar dikim. Ez bawer im di 1997'an de, ez nabêjim kengê, wê derkeve piyaseyê. Heya niha şeş kasetên min derketine, li Kurdistanê jî du hebên korsan derxistin, bûn heşt. Bes wexta ew organîzasyon ku ez dibêjim hebe, nikarin wêrê bikin, em dikarin hesab ji wan bipirsin.

# Helbestvanekî pêjnker

## Deham Evdilfetah



**M**in divêt, bi parçehelbestek ji helbesta mamosta Deham ya bi sernavê "Tamara" dest bi nivîsa xwe bikim.

(...)

*Her du çavên te, du tîr in  
Bêdilovanî di cergê min de*

*çikyan*

*Her du çavên te, du top in  
Di dil û cerg û hinavê min de*

*teqyan*

*Min nekîr ahî ji ber arê evîne  
Min nekîr axî ji ber derdê*

*birîne.*

Belê, tenê mirovekî welatperwer û birewer piştî tîkçûna hêviyeke mezin dikare wisa ji kevçîka dil binale û bika-le. Tenê mirovekî bîrbir ku bi salan di welatê xwe de dûrî welatê xwe, bêyî ku kesek ji pê zanibe, wisa bédeng û xem-gîn mabe, wê karibe axî û kesera we-latê parçebûyî bikêşe...

*Dev û lîvên sorbirînan  
Min li ser êşê dirûtin!*

*Min bi xwîna sorgulî  
Nav û nişanên birînen  
Her du çavên te nivîsîn;  
Kirne berbejnêk bi rengin*

*gulgulî*

*Kirne xeml û gerdenî  
Min bi sînga xwe ve berdan..*

Gelekî zor e gava ku bizavek, şoreşek, piştî westan û xebateke sext a salane, piştî ew qas kezbreşî, derbederî û malkambaxî bibe hêvî û gava ku ev hê-vî ber bi gopîtka armanca xwe ve bilind dibe û ji nişka ve ev hêvî ji wê bilindiyê bête xwar, li bin guhê erdê bikeve, ji hev tarûmar bibe, li hemberî dimeneke wisa xemgîn, her mirovekî hesttenik, digel hemû êş û azaran wê "dev û lîvên sorbirînan" bidirû û bi xwîna sorgulî wê "nav û nişanên birînen" xwe (azadî, şoreş û welat) bike "berbejnêk" rengîn, wê bike xeml û gerdenî û bi sînga xwe de wê berde xwar û heta hetayê, mîna derxikekê wê di kevçîka dilê xwe de av bide, biparêze û...

**Mamoste Deham, avakirina helbesta kevneşop (klasîk), helbesta serbest a kêşsaz û serbest a bêkêş li ser kîtan, li ser bingeheke zanistî û bi gelek nimûneyên cihêreng aniyê zimên. Her wisa mamosta Deham, piştî lêgerîn û berdestkirina peyvên resen ên kurdî, li hemberî peyvên erebî yên edebî, yek bi yek bi nav kirine û ew bi cih kirine.**

*Min berî daye riya kanya evîne,  
Rêberê min, li riya bûn û nebûnê  
Her du çavên te ne...  
Berbejnêk ji xwîne.*

Bêhêvîbûnî, li ba her mirovekî birewer tişteki zor kirêt e. Her wisa, nivîskar û helbestvan Deham Evdilfetah jî, digel tîkçûna hêviyeke mezin û digel dirûtina dev û lîvên sorbirînan li ser hemû êş û azaran, dişa jî bêhêvî nabe û berê xwe dide kanîka jîn û evîne, kanîka ku tu caran naçike. Kaniya gel. Kaniya ku berdewam rêber û lehengan di-afirîne.

### Jînenîgariya Deham Evdilfetah

Di sala 1942'an de, li Başûrê Biçûk î welêt, li navçeya Amûdê ji dayik bûye. Piştî qedandina xwendina xwe ya bilind li ser ziman û edebiyata erebî, gelek salan li fêrgehên Sûriyeyê mamostatîyê dike. Niha jî, ji mamostatîyê teqawid bûye û li Amûdê niştecih e.

Mamosta Deham, li salên 1980'yan, di kovarinen erebî de li ser toreya kurdî hinek gotar nivîsîne. Di van 6-7 salên rabûrî de, bi derketina kovarên kurdî li Başûrê Biçûk î welêt, gotar û nivîsên mamosta Deham (bi taybetî li ser rêzimana kurdî) berdewam derdikevin. Hêjayî gotinê ye ku ew, ne bes helbestvan e, her wisa nivîskar û lêkolînerekî berbiçav e jî.

### Berhemên wî

1- Bi kurdekî re axaftin, (1989). Werger e, bi zimanê erebî derçûye.

Mamosta Deham, di 'Antolojiya Edebiyata kurdî' (rûp. 123) de, derbare ve pirtûkê de wisa dibêje: "Ev pirtûk, diwana helbestvanê Grêkî Edonîs Budurîs e. Min diwan ji destnivîsareke kurdî wergerandiye zimanê erebî.

2- Li ber dergêhen Lales, (1990). Ev pirtûk, ji du helbestên dirêj bi sernavên "Tamara û Anahîta" bi zimanê kurdî û erebî derçûye.

3- Nerîneke rexneyî li helbestên kurdî (Lêkolîn û ravekirin, 1992). Ev ji 182 rûpelan û ji du beşan (A- Kilişeya ten û bedena helbestê. B- Naverok û

kakila helbestê) pêk hatiye. Wekî ji naveroke pirtûkê jî diyar dibe ku ev berhem encama kar û xebateke salane ye. Di vê berhema xwe de mamosta Deham, li ser helbest û helbestvaniya kurdî bi berfirehî û bi hûrbîni rawestiyaye.

Avakirina helbesta kevneşop (klasîk), helbesta serbest a kêşsaz û serbest a bêkêş li ser kîtan, li ser bingeheke zanistî û bi gelek nimûneyên cihêreng aniyê zimên.

Her wisa mamosta Deham, piştî lêgerîn û berdestkirina peyvên resen ên kurdî, li hemberî peyvên erebî yên edebî, yek bi yek bi nav kirine û ew bi cih kirine. Bo nimûne:

Wezin: kêş,

Qafiye: rêzbend

Buhûr: pêlawaz

Ji ber ku mebesta nivîsa min, bi kur-tayî danaşina nivîskar û berhemên wî ye, ezê nikaribim dûr û dirêj li ser vê pirtûkê rawestim. Lê min divêt ez bi-dim xuyakirin ku ev pirtûk babeta nivî-seke serbixwe ye. Heger hat û delîve helkeft, ji bo serwestkirina xwendevan-an ezê li ser armanc û mebesta vê pirtûkê rawestim.

4- Hindek ji aloziyên zimanê kurdî (Lêkolîn, 1993).

5- Muzîka helbesta kurdî (Lêkolîn, 1995) bi zimanê erebî.

Ji bilî van berhemên derçûyî yên mamosta Deham, temet ku ez dizanim, dastana Gilgamêş jî ji bo çapê amade kiriye.

Di encam de, digel daxwaza min a jiyekî têrberhem di rêka bi pêşdebirina toreya kurdî de bo mamosta Deham, bi parçehelbestek wî ya ji diwana "Li ber dergêhen Lales" ezê nivîsa xwe bi dawî binim.

(...)

*Tu dibê qey bi tena xwe*

*Em evîndar in li vê jîn û jiyane;*

*Da ku em barê evîndarên cihanê*

*Bi tenê, her du hilînin..*

*Bi tenê, em rê bibin*

*qoqê çiyayê Culculê*

*Bi tenê, her du li ser xaçê evîne*

*Em bibin sed wersele...*

(...)

DILDAR ŞEKO



Li navendên çandeyî çalakiyên vê heftiyê.

Li NÇM'a STENBOLÊ:

● 18.10.1996 Yekşem

Konser, Koma Rojhilat, saet 15:00, Teatra Jiyana Nû: "Zeviya jiyane", saet 18:30

● 16.10.1996 Çarşem: Panel: "Kimin GAP'i neye hizmet ediyor? (GAP'a kê ji çi re xizmet dike?)", saet 18:00, Lêger û nivîskarên beşdar: Lêkolîner-Nivîskar Arslan Başer Kafaoğlu, Lêkolîner-Nivîskar Mustafa Sönmez, Serokê Yekîtiyên Belediyeyên GAP Ahmet Özer  
Ji NÇM'a İzmirê Ahmet Kaya

● 18.10.1996 In: Panel: "Sendika bürokrasî ve işçi aristokrasî", saet 16:00, Ji hunerên dîbarî fîlmê Yılmaz Güney: "Duvar", saet 18:30

● 19.10.1996 Şemf: Ji NÇM'a İzmirê Şanoya Hêvi: "Sîmûrg û Ronahî", saet 14:00, Konsera Agirê Jiyana, saet 18:30  
Li NÇM'a İZMİRÊ:

● 18.10.1996 Yekşem: Semîner: "Perwerdeya bi zimanê zikmakî", axaftinbêjên beşdar: Dr. Ali Rıza Aslan, Lêgerîner Ahmet Kaya, saet 18:00

● 16.10.1996 Çarşem: Konsera Ozan Dellî, saet 18:30

● 19.10.1996 Şemf: Konsera Ozan Dellî, saet 18:30

## RÛDAN

# Kurdan qetlîama li Zîndana Amedê protesto kir



**Polîsan dîsa wekî her carê êrîşî gel kir. Nehîştin ku daxuyaniya çapemeniyê bê dayîn û qetlîama li Zîndana Amedê bê şermazarkirin.**

**L**i Tirkiyeyê her roj mirin heye, her roj qetlîam hene, ji bilî aşîxwazan tu kes deng nake. Dema kesên aşîxwaz li hemberî van bûyeran reaksiyonê nîşan didin mûameleya terorîstiyê bi wan re tê kirin.

Roja 6'ê Kewçêrê ji bo protestokirina kuştina 12 dîlên PKK'yî li Girtîgeha Amedê, hin saziyên kurdan xwestin li Qada Taksîmê daxuyaniyekê bidine çapemeniyê. Her tişt li Qada Taksîmê wekî jiyanekê rojane bû, bi tenê nûçevanê tv û rojnameyan bi kamerayên xwe amade bûn. Wan jî dizaniyên ku dewlet rê nade tiştêkî bi vî rengî, ji ber ku daxuyaniya çapemeniyê li ser kurdan bû.

Kesên ku dixwestin qetlîamê şermaz bikin, hê nehatibûn Qada Taksîmê polîs hazir bûn. Jin, zarok, ciwan, kal û pîr ji her cureyî însan hebûn, dema ku ketine Qada Taksîmê polîsan jî êrîş kir. Nehîştin daxuyaniya çapemeniyê bê xwendin.

Polîs ji bo ku kesên hatibûn xwepêşandanê bikaribin zû ji hev belav bikin, ji çar alî ve êrîş birin ser wan. Tu kes li hemberî êrîşê derneket, ji ber ku dixwestin bi awayekî bêxwîn çêbibe, lê belê polîsan bi heqaret û bi lêdan bi ser wan ve çûn, gel ber bi kolan û kuçeyan ve ajotin. Polîs di kolanên Taksîmê de

bi cop û çekên xwe, êrîşî ser xwepêşandanê dikir, dengê sîlehan dihat.

Li aliyê din li Qada Taksîmê jî hin rayedarên HADEP'ê ku dixwestin daxuyaniyê bixwînin jî, polîsan li wan heqaret dikirin û li wan dixistin. Di vê navê de nûçevanên ku dixwestin wêneyê wan bikişînin jî, ji qadê dihatine bidûrxistin, heta rojnamevana Evrenselê lêdan jî ji polîsan xwar.

Di dawiyê xwepêşandanê de 68 kes hatine girtin, yek bi guleyê hate birîndarkirin. Li Qada Taksîmê rojek ji rojên Kurdistanê hate jiyîn, lê kesên ku digotin kurd birayên me ne, ji wir bi dûr diketin. Bi tenê zarokeke 12-13 salî ji nûçevanên dipirsî, li vir çi dibe ev çi şer e? Dema ku min bûyerê jê re şirove kir, çavê wê sor bûn, wiha got: "Ka digotin li Tirkiyeyê şer tune...."

Kesên ku hatibûn girtin, roja 9'ê mehê derxistin Dadgeha Beyoğluyê. Di encamê de 34 kes ji aliyê dozger ve hatin serbestkirin, 12 jî hatin tahliyekirin û du kes bi navê Osman Laçın û Erdal Yılmaz jî hatin girtin. Ji aliyê din ve Mithat Karakaya ji ber ku qaçaxê lêşkeriyê bû hate girtin.

Digel vê yekê dema binçavkirina rayedarê HADEP'ê Cemal Çoşkun hate direjkirin.

M. AGIRÎ

## TÎŞK

SÎRWAN REHÎM



# Gelekomey ewan û helwêstî aşîxwazeney gelî kurd

**M**esele ne meseley kemasî yasayî MED-TV ye. Nexêr, her bo xoyan aşkirayan kird, "herdû lay gelekomeke" Tirkiye û Belçîka, tenanet hawkarekanîşyan danyan bewe dana ke em gelekomeye paşxanêkî dirêjî heye û le mêje kine bo girtinê MED-TV dekrêt.

Çend rojêk ber le gelekomeke "Piyawêkî hukumetî" le Tirkiyewe hatibuwe Ewropa, ew piyawe gûzerîşî kewte MED-TV. Piyawe hukumetiyeke ewey dirkand ke Çiller "Swêdî be şereftî xwarduwe, MED-TV le kar bixat", diyar e qisekanî ew piyawe le layen xebatkarani "TV" ewe be hend wernegira.

Be rojî diway hêrişekêş rojnamey Hürriyet nûsibûyî: "Belçîka xawenî qisey xoy bû." Pêştirîş wêney Haydar Akbaşay berêweberî Roj NV yan bo ew mebeste amade kirdibû. Rojî çarşem (18.9.1996) hêzî cerdirmey Belçîka be bê ewey hiç destûrêkiyan pêbêt, dabarîne ser MED-TV da û ew şaroçkeyşyan tenî ke baregay TV lê ye.

Hukumetî Bruksel le birî "çepke gûl û maçî rengawreng" bo ew kesane binêrêt ke rûnakî be çawî gelêkî sitemdîde debexşin (ke çawerwanî emey lînakrêt û em kare nakat) keçî cerdirmey hov denêrête ser ew dezgaye û kelepçe dexene destî karmendî TV. Sela le dîdarî demokrasî Ewropa û paytextekî!!

Diyar e em kare be ber çawî seranserî dinyawe kira, nek her eme belkû bûxtanî zor gewreyan da pal TV û wekû çeqî hevgerîni şite xirab û diyarde nabecêkan bed naw kira. Ya rastir wîstiyani bed nawî biken û lew rêgewe kare dirinde û nalebarekeyan dîze be derxone biken. Belam aya tiwaniyan?! Bêguman nexêr û serî zil û pûtiyan day le çiyay Agirî, Cûdî, Qendîl û Çiyay Mazî.

Belçîka le katêk da ke xoy kird be kewa sûrî ber lêşkirî dij be demokrasî û mirovayetî û sercem kelûpel û pêwîstiyekani MED-TV yan bar kird û dergakanyan mor kird, bem kareyan ziyaneke zor gewreyan (ziyanî madî) le MED-TV û ROJ NV geyand. Belam hawkat ducarî giriftêkî gewre bûn û pêyan bû be teleyekî dijarêwe, teleyek ke nek natwanin rewîştî doraw û nawbangî zirawyan bikrinewe, belkû tewa destkeyanî xiste rû.

Aşkîra ye, cerdirmey Belçîka em karey her be tenha le ber çawî reşî turkan be encam negeyanduwe. Nexêr, belkû hokarî tîrîş le piştî perdewe hen. Le bû cendirmey Belçîka be niyaz bû şan û şewketî xoy bomêj xelkî welateke bilengênê û bawerî dorawî xoy bikrête. Çûnke diwa be diway bûyerî "rifandîni kiçanî temen biçûk û laqekirdinyan û paşan kuştinyan", ke destî piyawanî dewletîş lew kare da hebû. Xelkî welateke tewaw birwayan be hêzî polîs û asayîş leq bibû. Ca baştirî rêgeçare bo hemû em kêşane sazdanî em gelekomeye bû, le diji MED-TV. Belam xoşbextane her le hengawî yekemewe rîsî diroyan buwewe be xûrî û pîlanekeyan bû be bilqî ser aw. Ew gelekomeye hiç derencamêkî başî bo ewan û xirapî bo gelî kurd be xora nehêna, cige le ziyani madî gewre ke we ber ew dezga neteweyî ye kewit.

Sê roj paş ew hêrişê nalebar û nabecêye, le Kölnî Almanya Kurdistaniyan le Festîvalî Aştî da kobûnewe û be hezaran gerû hawarî piştîgîriyan bo MED-TV bilind dekirdewe û MED-TV'ş rastewxo şadîmanî li piştîgîrî û kolnedaney pexîş dekirdewe. Ewe gewretirî narezayîyek bû ke gelî kurd le yek kat da beranber be berdewamî şer û rewîştî şerxwazan kirdî. Carêkî tîrîş selma ke gelî kurd le rewşê here sextekan da, tûştî demargirî û tûndrewî nabêt, belkû her ew gele aşîxwaze ye ke çepke gûlî aşî dexate naw încaney mirovayetiye.

# Heca rovî û secereya werdekê

**R**ojekê rovî, rabû çû ba dîk. Ji dîk re got: "Seyda, ka tu nayê em herin hecê, ji van gunehan tobe bikin." Li ser vê yekê dîk got: "Tu ji dil dibêji?"

Rovî: "Belê ez bi taca serê te sond dixwim, ezê herim hecê."

Dîk:

"Madem wilo ye, ezê jî werim bi te re."

Rovî ket rê meşiya û dîk jî li pey wî... Dîk û rovî di rê de meşyan, rastî kewê hatin. Wan û kewê, bi silav û hurmet ji hev pirsîn. Kewê got:

"Birayên ezîz, hûn ji ku tîn, diherine ku?"

Rovî got:

"Em diçine hecê. Ji bo ku em seba gunehên xwe yê kevn tobe bikin."

Li ser vê yekê kewê jî ji wan re got:

"Ezê jî bi we re werim."

Her sê heval bi hev re meşyan. Çûn gihîştine werdekê. Pirsê halê hev û din kirin, bi hev re gotine werdekê:

"Seyid, em diçin hecê, ma tu jî nayê?"

Werdekê:

"Bi rastî ezê jî werim."

Tev bi hev re ketin rê û meşyan. Dem bihurî, li wan bû şev. Tev de ketin şikeftê. Bû nivê şevê, wextê banga dîk hat. Dîk bang da, rovî ji dîk re got:

"Çima te wiha kir, birayê dîk?"

Dîk got:

"Ez mela me, wextê banga min hat. Gerek e ez bang bidim."

Rovî li kewê û werdekê nihêrî û got:

"Ya feqî, ya seyîd. Hûn çî dibêjin? Em xwedî dijmin in, em bi dizî hatine vir. Mele bang da, cihê me êşkere kir."

Kewê got:

"Bi Qurana ku min xwendiyê tu rast dibêji."

Rovî rabû serê dîk jê kir, di paşiya şikeftê de veşart.

Bû serê sibehê, îcar jî kewê xwend.

Rovî ji kewê re got:

"Ya feqî, ew çî bû te kir?"

Kewê got:

"Heyran welehî ez feqî me. Ez her

**Rovî got: "Madem tu seyid î, ka secereya te?" Hişê werdekê hingê hatin serî, ji xwe re, "Ewê îcar serê min jê bike" got. Vegerî ser rovî, got: "Secereya min li malê ye, gerek ez herim malê, secereya xwe û du şahidan bînim." Rovî got: "De here malê, lê zû were ha!!"**



sibe Yasîne dixwînim."

Rovî berê xwe da werdekê û jê re got: "Ya Seyîd, tu çî dibêji?"

Werdekê got: "Tu rast dibêji. Feqî çewtiyek kir."

Rovî rabû serê kewê jê kir. Goştê kewê jî xwar. Rojê avêt. Rovî gote werdekê:

"Ma tu seyid î?"

Werdekê gotê: "Belê ez seyid im."

Rovî:

"Madem tu seyid î, ka secereya te?"

Hişê werdekê hingê hatin serî, ji xwe re "Ewê îcar serê min jê bike", got. Vegerî ser rovî, got:

"Secereya min li malê ye, gerek ez herim malê, secereya xwe û du şahidan bînim."

Rovî fikirî, heke niha bixwe bi tenê ye, lê ku ew here malê secereya xwe û du şahidan bîne, dibin çar, lewre jî got: "De here malê, lê zû were ha!!"

Kêfa rovî xweş bûbû. Ji ber ku goşt jî xwaribû, hinekî sist jî bûbû, serê xwe ku çawa danî erdê, kete xewê.

Werdek bi rê ket. Bask û çengê wê jî bi wê re bi rê ketin. Dused metroyî çû, gihîşte nêçîrvan.

Nêçîrvan, bi tevî çek û rextê xwe derketibû nêçîrê. Li ber jî tajî û tûle hebûn. Werdekê kire gazî:

"Were ya nêçîrvan, ê ku tu lê digerrî, ez dizanim li ku ye."

Nêçîrvan da dû werdekê û meşyan. Hatin devê şikeftê. Rovî pejna wan kir. Serê xwe hilda, mêze kir. Dema ku nêçîrvan û tajiyê wî dît, got:

"Wey li vê ecêbê, ev nêçîrvan tev bi çek û tajiyê xwe, hatin bi ser min de girtin."

Ji werdekê re got:

"Ya seyîd, ne hewceyî secereyê ye. Bi Qurana ku min xwendiyê, ez bawer dikim ku tu seyid î."

Nêçîrvan tiving berda. Tajî û tûle çûn rovî ji şikeftê derxistin.

BEŞÎR AKAY

GIRTÎGEHA UMRANIYÊYÊ

## Şêr û kevroşka jîr û zana

**S**êrekî, havingehêk zept kiribû. Li ser heywanê vê mintîqê kiribû dorê. Çend cure heywan tê de hebûn.

Heywanên mezin çiqas roj yek dihat, şêr ew heywan dixwar. Heywanên biçûk rojê sê dihatin xwarin. Demekê wiha berdewam kir. Bû dora kevroşkan. Kevroşkan, êvarê civîna xwe kir. Mezinê wan got:

– Ev çî rezalet e, em qebûl dikin? Pêwist e ev şêr bê windakirin. Da ku bes vê zilm û zorê li ser heywanan bike!

Kevroşkekî ixtiyar destê xwe rakir got:

– Bila du kevroşk bi min re bînin. Emê sibê herin şêr bikujin.

Gotin: "Bila." Sibehê taştîya xwe xwarin. Du kevroşk bi hev re bir û çûn. Ji malê dûr ketin. Ji xwe re li siya darekî raketin, heta bû êvar. Gote hevalên xwe:

– Rabin! De em herin. Divê hûn xwe kulek bikin.

Bi kulekî meşin çûn cem şêr û şêr jî, ji birçiyên hişê wî nemaye, qîrek da wan û got:

– Heta niha hûn li ku bûn.

Kevroşka mezin:

– Em nizanin, mezinê me tu yî yan ji keynî te ne?

Şêr got:

– Ma, ji min pê ve mezinê we heye?

Kevroşk:

– Belê, yek li serê havingehê ye dibêje mezin ez im!

Şêr gotê:

– Bide pêşiya min, emê herin.

Kevroşk kete pêşiya şêr çû ser bîrê got:

– Ewê dibêje ez mezin im, di vê bîrê de ye.

Şêr çû ser devê bîrê wiha nêrî sûretê xwe tê de dît. Ji wî werê ye ku şêrekî tê de ye, xwe avêt nava bîrê û got:

– Va kesek tune ye.

Kevroşk got:

– Cihê te wê ev der be."

Ji DEVÊ MELE HESENÊ BASIKLÎ,  
BERHEVKAR: GULTEN ŞÛR

# Lêkolînek li ser zaravayên kurdî

Di vê pirtûkê de, mirov dikare wekhevî û cudatîyên zaravayên kurdî çî ji aliyê dengsaziyê ve, çî ji aliyê peyvsaziyê ve û çî jî ji aliyê rêzîmên ve bibîne. Nivîskar zaravayên kurdî dike sê biran; zaravayên Bakur, zaravayên Başûr û zaravayên Başûrê Rojhilat.

Enstîtuya Kurdî ya Berlînê li ser zaravayên kurdî pirtûkeke lêkolînî daye weşandin. Ev pirtûk bi navê "Kurdîzan (Rûberkirina zaravên Kurdî)" ji aliyê Fêrgîn Melîk Aykoç ve hatiye nivîsandin. Her wekî ji navê pirtûkê jî tê fêmkirin, di pirtûkê de bi hûrbîni li ser zaravayên kurdî tê sekinîn û ew tîr rûberkirin.

Di vê pirtûkê de, mirov dikare wekhevî û cudatîyên zaravayên kurdî çî ji aliyê dengsaziyê ve, çî ji aliyê peyvsaziyê ve û çî jî ji aliyê rêzîmên ve bibîne. Nivîskar zaravayên kurdî dike sê biran; zaravayên Bakur (kurmancî, kirmanckî), zaravayên Başûr (sorani, tevî hemû devokên xwe) û zaravayên Başûrê Rojhilat (lakî, feylî û devokên din). Ew vê dabêşkirinê bi gelek mînakên nîşan dide. Xaleke din a balkêş jî ev e: Zaravayê gorani di navbera zaravayên Bakur û Başûrê Rojhilat de cih digire. Ew ji aliyê rêzîmên ve zêdetir dişibe zaravayên Bakur. Pir kes vî zaravayî nêzî kirdkî dibînin, lê ji mînakên di vê pirtûkê de, xuya dike ku ew zêdetir nêzî kurmancî ye.

Wekî encama vê lêkolînê zaravayê kurmancî, wekî zaravayê herî bi rêkûpêk û dewlemend xwe dide pejirandin. Li ser vê mijarê di dawiya pirtûkê de ev tê gotin: "Hema bigire (kurmancî) karakterên hemû zaravan di nav xwe hildigire. Mirov dikane hemû zaravan, yan jî nîşanên wan di Kurmancî de gelek bi zelaî bivîne. Hete ez dikanim bi hêsanî bivêjim, Kurmancî zaravek hemû zaravan bi hev ve giredide, ye."

Ev berhem encama lêkolîneke giranbuha ye, lê di zimanê nivîskar gelek kêmasî balê dikişînin. Li gorî

dîtina min ji ber ku nivîskar bi xwe kirmanc (dimil) e, di bikaranîna zaravayê kurmancî de gelek çewtiyan dike. Wekî mînak, ji ber di kirdkî de zayenda peyvan ne wekî kurmancî ye, ew peyvekê hin caran wekî mê, hin caran nêr dinivîsîne. Dîsa ji ber ku di kirdkî de tewang ne bi rêk û pêk, guh neda qaydeyên tewangê, bi taybetî veqedandekên nebinavkirî yên yekjimar '-ek' hema bibêje, qet li gorî zayenda peyvê natewîne. Nivîskar di nivîsandinê de tîpên 'u' û tîpa 'û' tevî hev kirine.

## Mînakên ne di cih de

Li aliyê din nivîskar xwestîye di tegînên zimên de jî hevgerînekê di nava zaravayan de pêk bîne, lewre jî tegînên wekî yewmar, zafmar ji kirdkî girtine û peyva bûgîn ji zaravayê ardelanî girtiye, di cihê diyardê anglo fenomenê de bi kar aniye. Her wiha di cihê peyva çêkirin û pêkanîna kurmancî de virastina kirdkî hatiye bikaranîn. Bi dîtina min tegîn wisa bi hêsanî çênabin û yekîtiya zaravayan demeke dirêj dixwaze.

Di pirtûkê de digel gelek mînakên çewt, hinekên ku mirov li wan dikeve gumanê hene. Min divê çend mînakên bidim. Di rûpela 79'an de berden wekî ber+den hatiye destnîşankirin, lê xweş diyar e ku ew birdina sorani û birina kurmancî ye. Di rûpela 84'an de ducarkirdin wekî dû(v)+car+kirdin tê nimandin, lê xuya ye ku tu tîkiliya wê bi dûvê nîn e, ew ji hejmarê 'du' hatiye. Her wiha di rûpela 94'an de du mînakên wekî pey+hesiyan (pêhesiyan), pê+çî hene, bi dîtina min ev her du mînak jî ne di cih de ne. Dîsa, di rûpela 123'yan mînakên kirdkî de spêdar wekî spê+dar nîşan daye, mirov li vê mînakê dikeve gumanê. Di rûpela 124'an de, de+bar, di rûpela 127'an de, şîre+jîn jî wekî mînakên çewt balê dikişînin. Nivîskar peyva hesinger (r.139) bi lêkera gerandinê ve girêdaye, lê bi dîtina min ew ji lêkera kerdin, kirdin û kirin tê. Dîsa tu tîkiliya "ber+mal" ê bi maliştinê nîn e. Her çiqas di pirtûkê de peyva "têkçûn" wekî tê+k+çûn hatiye dahûrandin jî, baş tê zanîn ku dahûrîna wê ya rast di+têk+çûn e (r.100).

FÊRGÎN MELÎK AYKOÇ

## KURDÎZAN

Rûberîna Zaravên Kurdî



Di pirtûkê de veqetandeka nebinavkirî ya geljimar wekî '-în', awayê wê ye tewandî wekî '-nê' hatiye nimandin, lê awayê rast '-in' û '-ine' ye. Divê bê gotin ku pêşgotina ku li ser navê Enstîtuya Berlînê hatiye nivîsandin, bi gelek peyvên çêkirî hatiye dagirtin, wekî rastewan, evînmîrovî pêkêfxweşî, gelempericivakî, zanistbingeh, civakbeş û hwd. û ew jî hê di gava yekemîn de xwendevan zivêr dike. Lewre ji bo vê lêkolîna hêja pêşgotineke bi vî rengî bedbextiyek e.

SAMÎ BERBANG

## Dizê Agir li Frankfûrtê bû!

FAYSAL DAĞLI



Agir hat dizîn, dinya ronî bû! Li kêleka Zeûsê mezin, Afrodît a afat rûniştibû. Li standa hemberî wan Garîbaldî yê gundî û Spartakûsê kole li hev dinihêrtin. Li qatê binî wêneyên Mele Mistefa Berzanî û Mistefa Kemal, ji standên "Kardelen Yayınları" û "Millî Eğitim Bakanlığı Yayınları" awirên xwe yen tûj berî hev dabûn. Çend gav dûrî wan, çavên Gandî û çemê Ganj bi gaziyeke dawetkar temaşevanên xwe dibirin platoyên Hîndîstanê.

Belê li Frankfûrta Almanyayê, li fûara pirtûkan a navneteweyî, dîrok û pêşeroj bûn mêvanên hev, ji hev re behsa rewşa mirovahiyê kirin. "Mirov" li korîdorên agahiyê û li labîrentên rûpelan gerandin. Di vê rewîngiyê de "mîrov", berhemên xwe yên ku heta îro afirandine, dîtin. Astengên li pêşiya lehiya zanyariyê û pêşveçûnê dîtin û hevûdu nasîn. Careke din hat fêmkirin ku, sedsala me serdema zanistiyê ye, millet bi hejmarên

pirtûkên xwe, welat bi navên nivîskarên xwe...

Mêvanên li salona mezin ku qehweyên xwe di fincanên buha de vedixwarin, çavên wan diçû ser lewhayeke reş: "Kurdistan"! Ger wan çîroka ev neh herfên reş, ku li hemberî wan dalqandîye zanibûya, wê bi çêşeke ûhrewî destên xwe li ser pirtûkên vê standê bigerandana û her çiqas jê fêmkirana jî, li hemberî taswîrên ser bergên van pirtûkan, bêyî hemdê xwe wê heyecanek hiş bikirana. Belê, "Kurdistan" cara yekemîn tevî "Fûara Pirtûkan a Navnetewî li Frankfûrt"ê bû. Navê "Kurdistan" bi navê dewletên din, navê kurdan, bi navên gelên din, pirtûkên Kurdistanî, bi pirtûkên cîhanê yên din re di mekanekî de cihê xwe girt. Me ev roj jî dîtin. "Kurdistan"ê rûpela destpêkê qeliband. Axa mirinê ji ser xwe avêt. Lê pirtûkên me kêr, nivîskarên me hindik bûn. Ji bo ku bigihîje karwanê şaristaniyê gavên hût pêwîst bûn.

İsmail Beşikçi, dîsa di nav zincîrên xwe de li ser serê xwendevanên cîhanê, hovîtiya sedsala 21'an dianî ziman. Li hemberî wî, Barbaros, bi şûrê destê xwe û ala bi xwîn a "Tirkîye" xwendevan ditirsandin û kes nêzîkî xwe nedikir. Di nava bi sedan standên pirtûkan de bi tenê li standa Barbaros al hebû û tenê li standê pirtûkên zincîrkirî... Di nava bi sedan stanîdan de bi tenê "Kurdistan" bişev

bû hedefa êrîşa dijminên mirovahiyê, çend pirtûk û zincîra ku li hêja Beşikçi hatibû lefandin, biribûn. Mirovên fûarê, her çiqas fail nedîtîbin jî, wezna wîjdanê xwe leqandin û hukmê xwe dan: sûcdar Barbaros bû!

Dinya li Frankfûrtê bi qasî avahiya fûarê biçûk bûbû. Ji her nîjadî, ji her qewmî û ji her deverî însan li ber barana vî bajarî şil bûn. Bi milyonan pirtûk, bi sedan zimanî, bi tîpên cur bi cur, bi dehhezaran navên nivîskarên xwe anîbûn cem hev. Di çenteyê mirovekî de, pirtûkên; şaireke jin ji gundekî Dublin a Îrlandayê, filozofek ji Başûrê Afrîkayê ku ji bilî hevalên wî, kes wî nas nake, diketin hembêza hev. An jî çîrokeke kurdekî Mehabadê bi tîpên erebî û romaneke çermrosorên meksîkî bi tîpên latînî karîbû bala entelektuelekî misirî bikişîne...

Cihê fûarê qasî bajarekî biçûk fireh bû. Bi dehhezaran însan, bi rojan, di nava standên bi sedan welat û deveran de, birçîbûna mêjiyê xwe têr kirin û zanîna xwe bilind kirin. Siyasetvan, nivîskarên navdar, wezîr, zanyar, hunermend û her wekî din bi rojan ji pisporan pirsên serboriya çanda gerdûnî guhdar kirin.

Li Frankfûrtê careke din hat fêmkirin ku, hukmê pênuşê li ser hemûyan e û "Dizê Agir" di nav pirtûkan de veşartî ye!

# Medrese û sînema


**J**ew mêrdeko zahf dîndar beno. No wazeno ki domanê ci zey ci, dîndarî bê. Qandê coya, domananê xo pêro rîştê medrese. La belê qe jew domanê ci zey ey nêbeno. No jî vano:

-Se kirî se mekirî, lajê xoye wardî, zey xo kirî. No tepêşeno laje xo wardî jî rêşeno medrese.

Tim û tim xoya piya beno camîî. Ci ra çiçi wazeno se ci rê geno. Çiçi biwaza se dano ci. O waxt çêrmûd di newe sîname abiyê bî.

Xortî pêro şîye film tameşe kerdê. Nê lajekî jî wayştê xo rê film tameşe bikiro, pereyê ci çinêbî. Lajek rojê şîno pêrdê xo ra vano:

- Bawo bawo!
- Piye ci vano:
- Çiçyo, tiyê çi qîrenê?
- Lajek vano:
- Mi rê perey bidi.
- O jî vano:
- Tiyê perey se kirê
- Vano ki wazena xo rê şeker bigrî.
- Piye ci destê xo çekeno xo tunîk, 5 kaxitî vejeno dano ci.
- Lajek vano:
- Nê qîm nêkenê.
- O jî vano:




-Mi 5 kaxitî day to besê. Lajek: -Nê besî nî ye, hêveyna bidi O waxt bilet 5 kaxitî ya, la belê domanê ki şîye sînema lajekî ra vat bi ki sîname di film tameşe kardîş dî, gerek çewcêgî û kola jî bibo. Nê mebê se film tameşekardîş rind

nî yo. Qandê coya pêrdê xo ra fina vano. Mirê hevenyna perey bidi. Ti medê se ez camîî û medresa neşna. Lajek senîki wina vano. Piye ci 5 kaxitî daha dana ci. Lajek senî peran geno. Keye ra vejîyeno. Şîno sînamadi bilet geno û şîno zere. Zere di film xo-

rê temaşe keno. Fina ewneno ki seat biya des û jû. Hema sînema ra vejîyeno, rayş şîno keye. Keveî ver di nemnîyanê xo vejeno, vejeno ki merduwanan di veng tayn bê ro. Lajek şîno zere û kewno ortî miyan. Verxanî anceno xo sere (qot). Piye ci hema yeno zere û qîreno ciro: -Tiyê na seatî qotî? Lajek vano: Ez nûwa tepiya fina camîî nêşina. Piye ci vano: -Çi ra? O jî vano: -Ezo şîna camîî, tiyê qîrenê mi ra. Piye ci vano: -Na seat di camîî bena? Lajek vano: -Ulu Camîî di mewlît bibi, ez şîya vîja. Piye lajekî hema beno nerm û vano. -Lajê mi wino teva beno se, mi ra vaj û şo. Lajek vano: Bawo mi ti nêdiyê, qandê çoya mi nêşa to ra vajî.. Piye ci vano: -Aferim la to rê. Ti beluyo mi ra kewtê. Beluyo ti lajî minî, aferim to rê. MEMED DREWŞ

## BIXELAT... XAÇEPIRSA BIXELAT (37) XAÇEPIRSA

M	G	O	B	A
H	U	N	E	R
K	O	R	E	M
A	S	K	A	V
Û	K	P	E	R
M	O	T	O	R
P	A	L	L	Û
S	O	R	O	Û
R	Û	S	N	A



**Bersiva Xaçepirsa 35'an**


Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 37'an pirtûka **Kaseta ŞIYAR "Sezbendo" ye. Jêrenot:**

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe jî me re bişînin.


Kesên ku xelata xaçepirsa 35'an, pirtûka **Evdîla Pêşew "BIRA KUI"** qezenc kirine: **Berk Selçuk/ İskenderun, Abdullah Sezis/ Wan, Ayye Çelîk/ Batman, İ. Omerî/ Mersin, Dîlan Seyçuk/ Antakya, Berhim Kaya/ Stenbol, Mehmet Can/Balikesir, Samî Bager/Adiyaman, Celal Altay/ İznîr, Lale Mansur/Bolu**




Kesê diçe serdanê	Bihîşt	Bi farisî av	Zivîrina xwe ber	Sûreteki ji Quranê	Rojek
Şairek (Wêne)	Erênî, qebûl	Lê zêdekirin	Osmînyûm	Xwêhdan	
8		6			
Heqîqet			Kurdên Başûr Neodyûm		
Navekî mêran	2				
		3	Ap		Notayek
Dayik		Heywanê bar ... romen, gulaş	Ziman gran		
Çelek	1				Tipek
			Paytexta Yewnan		
			Nesne	9	
Dixne stuyê ga Vexwarîna sereke			Dînî		
	Sitla darîn			Îrdiyûm	
Ahû, xezal					
Qertafek	7		Temen, emr		Herfek
		Çemek li Sovyetê			



PEYVA VEŞARÎ





# Daxwaza lêborînekê û bersivek

**D**i sêzdemîn rûpela hejmara 35'an a Azadiya Welat de, di rûpela bi navê "Berhem" de, bi sernavê "Ji Evdila Peşew ne helbest helwest", ji bo nirxandina pirtûka bi navê "Bîrakuji" ya mamosta Evdila Peşew ku ji hêla weşanxaneyê Avesta ve hatibû weşandin, min nivîsek darêjtîbû. Ji ber nebûna berhemên mamosta Peşew li ber destê me û ji ber kêmagahiya der barê berhemên wî de, di wê nivîsê de kêmasiyeke berbiçav rûdaye. Piştî derketina nivîsa Avestayê, ez pê hesiyam ku heta niha heft pirtûkên helbestî yên mamosta Peşew hatine çapkirin.

Ji ber rûdana vê kêmasiya xwe ya diltezîn, ji helbestvanê hêja Evdila Peşew bi taybetî û ji xwendevanên hêja yên Azadiya Welat bi giştî daxwaza lêborînekê dikim.

Her wiha kêmasiya din jî di gava jiber-girtina hinek mînakên de rûdaye. Diviyabû wekî xwe mabûna.

## Zimanê helbestî û

### 'kêşarezayî'ya zimên

1- Yek ji armancên peydabûna helbesta serbest jî, bêtî ku peyv bêne qurmiçandin, bi şeweyekî rêzimanî pêkanîna helbestê ye. Di helbesta kevneşop de, ji ber hebûna kêş (wezin) û rêzbandan (kafiye), pîrî caran ê helbestvan pêwîstiyê bi qurmiçandina peyvan û bi baskokirina kîteyan dibîne. Lê di helbesta serbest de, ji ber nebûna kêş û rêzbandê ev pergal nê e.

2- Bi taybetî jî karê wergerandina helbestê karekî sext e. Di gera ziman de ji bo kesên wergêr şarezayîyeke berfireh divê. Devoka herêmkî bi tena xwe ji bo wergerê têrê nake. Danîna peyveke ne li cih, xeml û rewşa helbestê bêserûber dike, naveroka wê sist û xav dike. Ji bo daxuyakirina mebesta xwe, ezê dîsa ji pirtûkê (Bîrakuji) çend nimûneyan bidim.

'Li ser kurtî û dirêjîya mûyê dûvê dewê' rûp.15

Gava ku dewar tê gotin, heşp, ker, hêstir, ga, gamêş û hwd. tene bîra mirov. Têrî, kurî, dêl a van dewaran heye, lê dûvê dewaran tune ye. Ji ber ku dûv tenê yê mîh û beran e û ev giyanewer jî di çîna dewaran de cih nagirin.

'Her bi şehîdan bilind bû serê me,

**Bi danîna sernavê (Ji Evdila Peşew ne helbest helwest) jî mebesta min ne rexnekirina helbestvaniya Peşew e, tenanet min xwest helwesta wî ya li dijî rewşa başûrê welêt bidim xuyanîkirin.**

wan jî kirin pezê xwe"

"Renga jî we beş kir"

"Niştîmanek we kir bi du"

"Li her malê agirdankê kirin bi du"

"Hemû dinya bi serokek lê bûye bela

Ê me ew jî du jê hene."

Ev rêzên han hemû di rûpela 17'an de û di yek helbestê de ne. Ev hevok, bi vî rengê ku wergêr darijtiye ji layê kurdan ve tu carî nayên bikaranîn. Heger wergêr, li şûna "wan jî kirin pezê xwe" 'we ew jî kirin pezê xwe', li şûna "renga jî we beş kir" 'we reng jî dabêş kirin' û hwd. darijtiyêna, hem hevok rêzimanî û muzîkî dihat û hem ji layê têgihîştinê ve jî wê bi hêsantir bûbûna.

Bi kurtayî, mebesta min ji peyva 'kêşarezayî' bi vî rengî ye.

## Bersiva Avestayê

Di 36. hejmara Azadiya Welat de bi îmzeya Avestayê 'nivîs'ek derket. Di vê 'nivîs'ê de Avestayê, di bin sîtava 'rexne û rexnegiriyê' de şûrê xwe seqa kiriye, gurz û rimê xwe rakiriyê û ne bes li hemberî kesatiya min, li hemberî xebatkarên rojnameyê bi giştî, cengeke Rostemî ya narewa (neheq) ragihandiye.

Berî her tiştî, li dijî Weşanxaneyê Avestayê, ji bilî pesndanê peyvek ne li rê di nivîsa min de cih negirtiye, heta ku berdevkê Avestayê bi peyvên "çors", li ser navê weşanxaneyê mafê 'rexne'kirinê û bersivdanê karibe di xwe de bibîne. Tenê wergêran dikaribû bersiv bidana rexneyên min.

Bi danîna sernavê (Ji Evdila Peşew ne helbest helwest) jî mebesta min ne rexnekirina helbestvaniya Peşew e, tenanet min xwest helwesta wî ya li dijî rewşa başûrê welêt bidim xuyanîkirin.

Berî nivîsînê min ji Avestayê daxwaza berhemên mamosta Peşew kir. Dîsa bi wî şeweyê xwe yê 'elatewş' wisa bersiva min da: "Yaho, ma ji rexneyê pê ve tiştêkî din bala we nakişîne; şerê birakuji, reva kurda...!" Di 'nivîsîn' a xwe de jî berdevkê Avestayê wisa dibêje: "Di van rojên ku bi de'hezaran kurd, ji şerê birakujiyê direvin, li ber sînoren da-

gîrkeran dibin pêl, bi navê Bîrakuji kitêbek weşiya..."

Berdevkê Avestayê, her wekî tiştêkî ku kes pê nizane dikeşifîne; Şerê birakuji! Lê ew nizane ku gelê kurd, qonaxa şerê birakujiyê di sala 1966'an de bi dawî aniye. Bi dûv re jî 'şerê hevkujiyê 1978, şerê kurdkujiyê 1982, şerê xwelîseriyê 1992, şerê xwekujiyê 1994'.

Gelê kurd ev qonax yek bi yek bi nav kirine û derbas kirine, lê berdevkê Avestayê hîna serapîra bi dûv reklama şerê birakujiyê ketiye û dixwaze ji nû ve bi kurdan bide nasîkirin. Ji bilî wî her kes dizane ku ev şer, ne şerê birakujiyê ye, şerê bîdestxistina desthilatdariyê ye û ev rengeşer, ne bes di nav kurdan de, di nav tevaya gelên cîhanê de, ji destpêka peydabûna dewletbûnê rûdaye, rûdide û wê rûbide. Her wisa berdevkê Avestayê li ser navê 'ciddiyetê' û 'hed'zanîne, ji libek tîrî mehsereyek çêkiriye. Dibêje:

"Vê nivîsê xelet fam nekin! Ne nivîsa Tizyan, hezar nivîsên wek a wî, biqasî serê derziyê tesîreke negatîv li weşanên me nakin. Ji xwe kes jî -li serî ew- ji nivîsa wî tiştêkî fam nakî. (...) Û belkî ji we hemûyan bêhtir girêdaneke me ya manewî bi vê rojname re heye."

Ji darijtiya gotinên wî xweş xuya dibe ku ev mirov hez ji peyvên erebî û latînî dike, lewre nivîsa xwe bi peyvên wekî 'Îtham, xelet, eletewş, cidiyet, mesûliyet, tesîr, îktibas, fonksiyon, formasyon, tradisyon, îzolasyon' tîjî kiriye û bi ser de jî, çima ku ez peyvên kurdî yên resen bi kar tînim, min bi tîrkirina kompleksê gunehbar dike. Dibe ku berdevkê Avestayê agah jê nebe, lê peyvên ku ez bi kar tînim, peyvên her du zaravayên kurdî (kurmançiya jêr û jor) yên hevpar in.

Di encam de, berdevkê Avestayê dibêje ku girêdayîna wî ya manewî bi rojnameyê re ji hemû xebatkarên rojnameyê zêdetir e, lê ev nivîsa wî asta girêdana wî ya manewî xweş destnîşan dike.

D. Ş. TIZYANÎ

